# Azadiya WELAT

Rojnameya Hefteyî

153

1-8 rêbendan Ocak 1999

BUHA (Fiat) : 200.000 TL

ISSN 1301-7497


## Kî tilyakfiroş e, kî bertîlxur e ne diyar e

# Li emniyetê bazara tilyakê









✔ Emniyeta Stenbolê bi daxuyaniyên midûrê şaxa narkotê yê berê Ferruh Tankuş li hev ket. Bi gotinên wî diyar bû Midûrê Emniyetê yê Stenbolê jî di nav de gelek kesên ji emniyetê ji mafya û tilyakfiroşan bertîl wergirtine. Bi teslîmbûna Hüseyin Uzun re, diyar bû ku Ferruh Tankuş jî di nav polîsên bertîlxur de ye. Tê gotin Tankuş zilamê Mehmet Ağar e û tayînbûna wî jî têkildarî tasfiyekirina ekîba Ağar e.

Tiştê ku bi van bûyeran derket holê ev e ku têkiliyên mafya û tilyakfiroşan digel polîsên payeberz ên emniyetê gelekî xurt in. Dîmênên di televîzyonan de yên ku Hasan Özdemir, cîgirê wî û Ferruh Tankuş digel hev li hemberî tilyakfiroşan serkeftî nîşan didin çêkirî û derewîn in.


Hevpeyvîn digel Romanivîs H. Metê: Divê mirov di nivîsînê de çikûs be - R. 8-9

Şehîd-Bîranîn: Cuma Karaçalı - R. 6

Lêkolîn: "Polîtîkayên pişaftinê yên mêtîngeran" - R. 4

Serokê HADEP'a Amedê F. Çelik: Hesabê wan dê di gewriya wan de bimîne - R. 16

## Di nava dewletê de pêvajoya hevtasfiyekirinê:

# Li emniyetê bazara tilyakê

**Kesên ku Tankuş tayîn kirine ji mafyayê li dora 4 milyon dolar pere wekî bertîl standine. Ew kes jî di nav emniyetê de di radeya herî bilind de ne. Berî ku Hüseyin Uzun bê kuştin di îfadeyên xwe de diyar kiribû ku Farruh Tankuş û gelek kesên din yên di nav emniyetê de çeteyên bertîlxur ava kirine.**

Her roj kirêtiyeke nû ji nav dewleta tirk xwe dide der. Piştî pêvajoya Susurluk û girtina Alaattin Çakıcı, vêga jî Midûriyeta Ewlekariyê ya Stenbolê bi bertîl û tilyakfiroşî û her wiha bi hevkariya mafyayê serobino bû. Roja 20'ê meha berfanbarê di Miduriyeta Ewlekariyê de hinek guherîn pêk hatin. Piştî ku Ferruh Tankuş ji Miduriyeta Ewlekariyê ya Narkotîkê tayînî Miduriyeta Ewlekariyhe ya navçeya Beyoğluyê hate kirin, ji aliyê Tankuş ve daxuyaniyên balkêş hatibûn ragihandin. Tankuş diyar kir ku kesên ku ew tayîn kirine, ji mafyayê li dora 4 milyon dolar pere wekî bertîl standine. Di nav wan kesên ku ji mafyayê pere standine de navê Midurê Ewlekariyê yê Stenbolê Hasan Özdemir û navê cîgirê wî Ercüment Özbeyli derbas dibe. Bi pey daxuyaniyên Tankuş, Ercument Özbeyli ji bo ku wî tayîn bikin, ji tilyakfiroş Sultan Doğan, ku berî vêga bi demeke kurt li Mêrsînê 375 kîlo tilyak li ser hatibûye girtin, li dora 4 milyon dolar pere standine. Tankuş di berdewama daxuyaniyên xwe de wiha axivî:" Hinek der û dorên ku tilyakfiroşiyê dikin, ji xebata me aciz dibin. Berî vêga bi demeke kurt ji aliyê şubeyên narkotîkê yên midurîyetên Mêrsîn û Stenbolê ve operasyon hatin lidarxistin. Di wan operasyonan de li dora 375 kîlo tilyak hate bi dest xistin. Divê baş li kirinên Sultan Doğan bê kolandin. Özbeyli, Doğan di erebeya xwe ya fermî de vedişêre." Her wiha Ferruh Tankuş di daxuyaniyên xwe de dide zanîn ku Doğan berî vêga li Etîlerê bo kurê Hasan Özdemir, Aykut Özdemir jî, daîreyeke bi 150 milyarî kiriye. Ji aliyê din ve li gorî daxuyaniyên Tankuş, têkiliya Midurê Giştî yê Ewlekariyê Necatî Bilican jî bi tilyakfiroşan re heye. Tankuş da xuykirin ku berî vêga bi demeke kin li Qesra Çırağan Bilican plaketek daye birayê M.Hayri Katmerci, ku wekî tilyakfiroş tê tawanbar kirin û wiha dom kir:" Di der barê M.Hayri Kamerci û birayê wî Yılmaz Katmerci de du dozên ji hev cuda, ku wekî tilyakfiroş tên tawanbar kirin, hene. Di der barê wan de dosye hatine vekirin. Ez û jina xwe çûne şevê, min meyizand ku Midurê me plaketê dide wî, ji ber wê yekê min jî mudaxele nekir."

Li ser van îdeyan Bilican jî daxuyaniyeke balkêş da çapemeniyê û wiha got:"Di warê têkoşîna bi çeteyan re hinek kes dixwazin ku li ber me bibin asteng." Wezîrê Karê Hundirîn Kutlu Aktaş jî da xuyakirin ku ew dê wan daxuyaniyan li ber çav bigirin û dema tiştekî wisa hebe, ew li tu kesî jî avê venexwin.

**Tankuş da zanîn ku berî vêga bi demeke kin li Saraya Çırağanê Necati Bilican plaketek daye birayê M.Hayri Katmerci ku ji tilyakfiroşiyê lê tê gerîn. Tankuş di daxuyaniyên xwe de diyar dike ku Doğan berî vêga li semta Etilera Stenbolê bo kurê Hasan Özdemir, Aykut Özdemir jî, daîreyeke bi 150 milyarî kiriye. Divê baş li Sultan Doğan bikolin. Özbeyli, Doğan di erebeya xwe ya fermî de vedişêre.**



Hüseyin Uzun



### Li emniyetê înfaz

Piştî ku Ferruh Tankuş ji kar hate dûrxistin, tilyakfiroşê bi navê Hüseyin Uzun, ku ji aliyê polîs ve lê dihate gerîn, xwe spart emniyetê. Ji îfadeyên Uzun gelek tiştên balkêş derketin. Bi pey îfadeya Uzun gelek rêveberên emniyetê yên payeberz bi mafya û tilyakfiroşan hevkariyê dike. Lê piştî ku Uzun ev daxuyanî dan ji emniyetê termê wî derket. Li gorî ercama rapora otopsiyê Uzun xwe kuştiye. Lê ev yek ji aliyê parêzerên wî ve bi awayekî din tê şîrovekirin. Bi pey ragihandina parêzerên Uzun ew hatiye înfazkirin. Di der barê vê yekê Parêzerê Hüseyîn Uzun yê bi navê Zekai Şems diyar dike ku wî, Uzun li DGM'yê dîtiye, morala wî jî baş bûyê, tu nexweşiyeke wî ya derûnî jî nîn bûye. Şems, di dirêjahiya axaftina xwe de wiha got:" Awayê întîxarê ne mantiqî ye. Bataniya ku dibêjin xwe pê daleqandiye, li dora 56 santîman stûr e û 30 cm jî dirêj e. Dibêjin bi vê qurdeleyê, xwe bi boriya qalorîferê ve daleqandiye. Bilindahiya dîwarê qalorîferê 150 cm. Bejna wî 1.80 santîm e. Giraniya wî jî ji 100 kîloyî bêhtir e. Mumkun e ku bi vî awayî nigê vî kesî ji erdê bên birîn û xwe bikuje. Midurê ewlekariyê berî ku, dozger otopsiyê bike li ser kîjan esasê dibêje bûyer întîhar e."

Berî ku Hüseyin Uzun bê kuştin, di îfadeyên xwe de diyar kiribû ku Ferruh Tankuş û gelek kesên din yên di nav emnîyetê de çeteyên bertîlxur avakirine.

### Emniyet tilyakfiroşî û hikûmet


Bi pey ragihandina Feruh Tankuş piştgir û dilxwazê Mehmet Ağar e. Balkêş e, dema ku Tankuş li Elezîzê bi dest kar kiriye, tilyakfiroşan ji Amedê barkirine Elezîzê. Yanî li gorî wan navenda tilyakfiroşiyê li Amedê bûye, lê piştî ku Tankuş çûye Elezîzê, Ağar navenda tilyakfiroşiyê barkiriye Paluya Elezîzê. Berî vêga Ağar ji ber Qezeya Susurlukê hatibû darizandin.

Heta niha di der barê tilyakfiroşî ango bertîl standinê de navê gelek bûrokrat, siyasetmedar û karsazên tirk derbas bûye. Berî niha hikûmeta Mesut Yılmaz ji ber ku têkiliya wî bi tilyakfiroş Çakıcı re hatibû selmandin, ji hikûmetê hate xistin. Dîsa digel van yekan, têkiliya gelek karsazên ku bi karê tilyakfiroşiyê radibin, bi emniyet û hikûmetan re hebûn. Wekî mînaka Korkmaz Yiğit. Yiğit jî hevkar û piştgirê Alattin Çakıcı bû. Bi saya Çakıcı gelek şirket avakirin û banka standin û her wiha tu nemabû ku hemû medyayê bikire. Bêguman dê ev yek bidomin. Wisa xuya dike ku dê tiştên balkêştir li pêşerojê derkevin holê. Dema mirov van rûdanan bide ser hev, dê bibîne ku di nav dewletê de pêvajoya hev tasfiyekirinê dest pê kiriye.

AZAD ALTUN

*Şahîd û beşdarê salên dijwar û dîrokî:*

# Cuma Karaçalı (Ali Çiçek)



Cuma Karaçalı, ji sala 1980'yî heta 1991'ê bi her awayî bo doza Kurdistanê xebat kiriye. Dema Berxwedana Sêweregê ew ji Tarsûsê berê xwe dide welêt û li dijî Bucakan şer dike. Peyre li salên 1983–84'an de di Girtîgeha Amedê dimîne û di berxwedanên vê demê de cih digire. Dema li Girtîgeha Eskişehîrê ye, tûnela ku dikolin tê dîtin û wî dişînin Aydınê.

Hevalê Cuma Karaçalı (Ali Çiçek), di sala 1963' yan de li Sêweregê ji dayik bûye. Malbata wî pir feqîr û hejar bû. Di dema zarokatiya wî de, malbat ji ber berberiyê (kan davası) berê xwe dide Tirkiyeyê û li Tarsûsê bi cih û war dibe. Hevalê Cuma li Tarsûsê mezin dibe lê tu caran pêwendiyên wî bi Kurdistanê re qut nabin. Wekî gelek malbatên kurd, malbata Hevalê Cuma jî têkiliya xwe bi nas û mêristana xwe re qut nake û ew her tim diçin Sêweregê. Cuma, hesreta welêt û gel tim dikşîne lewre ji mercên jiyana metropolê pir aciz dibe û roj bi roj hesreta welêt di dilê wî de mezin û geş dibe.

Ev hesreta welêt û gelperwerî, wî li hemberî rûdanên ku li Kurdistanê pêk tên, diltenik û baldar dike. Her ku meselê ji hev dikir, hê bêhtir nezîkî Kurdistanê dibû. Dema didît ku jiyana metropolan mirovan basko dike, jê sar dibû û nefret dikir. Lê mixabin tu hêzeke ku bikaribe wî ji vê jiyana gemarî xelas bike û bigihîne jiyaneke birûmet nedidît. Ev jî gelekî pê zor dihat. Ji ber helwest û tevgera rêxistinên din dilê Hevalê Cuma bi wan germ nedibû.

### Dema Berxwedana Sêwregê

Hevalê Cuma dêstpêka Berxwedana Sêweregê, ji hesret û hêviyên dilê xwe re wekî bersivekê dît. Ji kêfa lingên wî erd nedigirtin. Piştî çend êrîşên şoreşgerî, ku mêjiyên bûbûn kole hejandin, ew jî bi rastiya xwe dihesiya. Êdî kesî nikaribû wî li Tarsûsê bigire. Lewre berê xwe dabû Sêweregê. Jixwe ji berê ve Hevalê Cuma teror û zordariya Bucakan baş dinasî. Baş pê dizanî ku ew bi sed salan e hevalbendê dijmin in û ji ber wan gelek malbatan ji welêt koçî welatên din kiribû.

Di bihara sala 1980'yî de hatibû Sêweregê. Hê me nû hev du naskiribû, di axaftina me ya pêşîn de, hesreta wî ya bo têkoşînê dihate xuyakirin. Cehd û hewla wî ya mezin, kir ku dilê hevalan zû li wî germ bibe. Hevalê Cuma ne şoreşgerekî demdemî û dudil bû. Lewre her çend di dema 12 Rezberê de gelek kesan ji nav refên şoreşê baz dida jî, wî hê bêhtir bi têkoşînê re pêwendiya xwe xurt dikir û ji bo geşbûna têkoşîn û parastina nirxan cehdeke mezin dida. Dema heval şehîd dibûn an jî dîl diketin, kel û hêrsa dilê wî radibû û dixwest tola hevalên xwe hilde.

Hevalê Cuma bi tenê bi zanabûn û biryardarî xwe ya neteweyî nedihate naskirin, her wiha bi dilpakî û dilsoziya xwe jî di nava gel de nav û deng dabû. Jiyana metropolan tesîreke mezin li wî nekiribû. Te digot qey hîç ji Kurdistanê derneketiye. Ji ber vê yekê zû bi zû bi gel re têkilî danîn û dilê gel jî pê germ dibû.

Berî faşîzma 12 Rezberê û piştî wê gelek endam û şervanên Partiyê hatibûn girtin. Li Sêweregê çend heval tenê mabûn. Di demên wisa dijwar de, ji bo ku yek li ser piya bimîne, divê xwedî îrade û dilsoziyeke mezin be. Di mercên wisa de, ji çend hevalên ku di bin fermandariya Hevalê Şahin Kilavuz de çalakî pêk dianîn, yek ji wan jî Hevalê Cuma bû. Her çiqas demeke kurt di nava refên têkoşînê de mabû, baş têgihiştîbû bê yekî Apocî divê çawa li hemberî dijmin bisekine.

Hevalê Cuma li dijî dijmin bi her awayî xwe amade dikir û bo têkoşîneke temendirêj xwe saz kiribû. Lê li dû bêsiûdiyekê kete destê dijmin û 11 salan di girtîgehê ma. Ew, di dema 12 Rezberê de, ku hovîtiyên dijmin roj bi roj zêde dibûn, ketibû destê dijmin û di vê demê de îrade û dilsoziya mirovan zû eşkere dibû. Hevalê Cuma ji pêvajoya pirsiyariyê (soruşturma) bi serbilindî derket û li ser gotina xwe ya ku dabû gel sekinibû.

### Serpêhatiya tûnel kolînê

Piştî pêvajoya pirsiyariyê, Hevalê Cuma hate veguhaztin bo Girtîgeha Amedê. Cara pêşîn neyar ew dabû xewxaneyên rêxistinên birjuwayên biçûk û reformîstên kurd. Li vê xewxaneyê tu girtiyên PKK'yî tunebûn. Lê dîsa jî ji ser xeta PKK'ê nehat xwarê û li dijî êrîşên hov û dirinde xwe ji xiyanetê parast. Dijmin tevî êrîş û çewşandineke dijwar jî zora îradeya Hevalê Cuma nebir. Wî, bi biryardarî û dilsozyeke mezin di çalakiyên rezbera 1983'an û rêbendana 1984' an de cih girt. Me bi çavê serê xwe berxwedêrî û têkoşeriya wî dît.

Hevalê Cuma her tim bi hesreta gihaştina Partî û gel dijiya. Bedenên kelehan jî li ber vê armanca wî nikaribûn bibin kelem û asteng. Bi vê baweriyê di sala 1987'an de gihîşt armanca xwe. Bi hemû hêza ciwaniya xwe, rêça pêkanîna xweziya dilê xwe bi destê xwe vekir. Ji bo pêkanîna destanên nû hilma derve hîs kirîbû. Bi rêhevalên xwe re di bin heft qat deriyê hesîn û têlên hûnandî de, di riya bin erdê re azad dibûn. Li Gabar, li Botan dijiyan...!

Bi gelek zahmet û fedekariyên mezin hatibû çêkirin, ev riya ku xwe di bin erdê re direjî azadiyê dikir. Ev rê (tünel) bi êrîşeke dijmin xera bû. Bi şikêstina vê hêviyê, hemû heval gelekî pê êşiyan lewre hêvî û keda wan bi avê de çûbû. Piştî vê bûyerê ew û gelek hevalên wî veguhaztin Girtîgeha Eskişehirê.


Di sirgûna dijwar û hov ya Eskişehir û Aydınê de Hevalê Cuma jî di nav rêwitiya ku H.Hüseyin Eroğlû û M.Yalçınkaya tê de şehît ketin, cih girt. Wî, ev helwest û tevgera xwe ya biryardar, heya sala 1991'ê, ku derket derve, berdewam kir. Jiyana xwe ya zindanê, layiqî doz û xeta Partiyê bir serî. Êdî heval Cuma azad e...!

Ew, dawiya dawî gihiştîbû daxwaza xwe. Navend û wezîfeyên ku hesreta wan dikişand li ber destê wî bûn. Hesabekî wî yê nîvçemayî hebû û diviya bihata dîtin. Sêwereg di nava welêt de bêdeng û bêhis mabû, êdî dema cardin dadana agirê şoreşê hatibû. Bi sonda hildana tola hezar salan, ji Qada Serokatiyê, piştî 11 salan bere xwe da Sêweregê. Hê di nava xebata ji bo fetihkirin û girêdana bi Botanê de bû, dîsa lîstikên xiyanetkar û kirêt derfet neda ew ku armanca xwe bi cih bîne. Di demeke ku wê bikaribe bo welat û şoreşê xebat û xizmetên mezin bike, şehîd bû û kete nav refên pakrewanan.

** Ev nivîs ji girtîgehê bo me hate şandin lê ji ber ku nivîskar navê xwe nenivîsandibû, em nivîsê bênav diweşînin.*

www.arsivakurdi.org

## BÛYERINE JI DÎROKÊ



❑ 8-27 rêbendan 1995:

**Kongreya PKK'ê ya 5'an hate lidarxistin**

Kongreya pêncemîn a PKK'ê di navbera 8-27'ê rêbendana 1995'an de li Kurdistanê pêk hat. Di kongreyê de digel gelek biryarên din, biryara guhartina ala partiyê û payeya sekreterê giştî hate girtin. Das û çakûç bi meşaleyê û payeya sekreterê giştî jî bi payeya serokê giştî hate guhartin. Di kongreyê de ev kongre wekî "Kongreya Serkeftinê" hate binavkirin.


❑ 8 rêbendan 1996:

**Metin Göktepe hate qetilkirin**

Di 8'ê rêbendana 1996'an de xebatkarê rojnamaye Evrenselê Metin Göktepe ji aliyê hêzên dewleta tirk ve bi îşkenceyê hate qetilkirin, lê wekî ku ji dîwêr de ketibe hate daxuyandin. Li ser reaksiyona raya giştî, piştî demeke dirêj der barê polîsan de doz hate vekirin. Lê ew jî piştî demekê yeko yeko hatin berdan.

Di mehkemeya dawîn de hemî polîsên girtî hatin berdan.

# Kursên mûzîkê dest pê kir



Akademiya Çand û Hunera Kurdî ku ev bû sê sal li Ewrûpa xebatên li ser şano, muzîk, folklor û hwd. dimeşîne, projeyeke nû da destpêkirin. Armanca herî mezin a Akademiya Çand û Hunera Kurdî ev e ku kurdên Ewrûpa ku mecbûr mane li derve bijîn, bi çand û hunera wan re girê bidin. Di vir de tiştê herî girîng jî, Akademiya Çand û Hunera Kurdî dixwaze di navbera kurdan û çandê de bibe pirek.

### Hînî stranên xwe bibin

Akademiya Çand û Hunera Kurdî, kursên mûzîkê da destpêkirin. Kurs ji hefteyê pênc roj in û ders wê li ser van xalan çêbibin: saz, gîtar, erbane, nota-solfej, qanûn....

Ji bilî van kursan her wiha ji bo ku zarokên temenê wan di navbera 6-12 an de ye dersên taybetî dê werin dayîn.

Li gorî plansaziya Akademiya Çand û Hunera Kurdî dê ders di van rojan û deman de werin dayîn: Saz: Yekşem-demjimêr: 11.00-16.00. Gîtar: Pêncşem- Demjimêr: 13.00-17.00. Erbane: Sêşem-Demjimêr: 14.00-16.00. Qanûn: Sêşem-Demjimêr: 17.00-19. Mey: Çarşem-Demjimêr: 19.00-20.30. Nota-Solfej: În-Demjimêr: 18.00-20.30.

PERWER BENGÎ /ALMANYA

## BÎRANÎN

*Niha Hilo gihîştin hêlînên xwe û çiya gihîştin mirazê xwe... Niha rojê tîn da Saryayê û Saryayê bi govenda çiyayan xwe gihand Rotînda... Niha zeman li her cihî wekî hev e. Li çiyayan heman dem, li zindanan heman dem, li deştan heman dem û li bajaran heman dem. Yanî yek dem. Li ku be jî, yek dem. Li ku be jî yek dil. Yek govend, yek Hêlîn, yek helbesta Amedê û yek Destana Silopiyê. Yek kezî û yek Kezîban. Niha li Zindana Amedê, helbest û agir gihîştin hev. Niha hemû jinên Kurdistanê ketin govendê. Niha hemû jinên Kurdistan agir li bedena xwe pêçaye. Wan wekî dayikekê hembêz kiriye ev agirê pîroz. Û niha wekî zarokekî berşîr li êgir dinihêrin û lê xwedî derdikevin.*

*Helbet emê jî lê xwedî derkevin. Helbet emê jî wek demekê lê binihêrin û di nava wê re derbas bibin û bimeşin ber bi azadiya xwe ve, bimeşin ber bi mirovahiya xwe ve.*


*Di çaremîn salvegera şehadeta hunermenda nemir Hêlîn Başak Kanatê de, em hemû şehîdên azadiyê û yên NÇM'ê bi bîr tînin û em dibêjin, ew dê her tim di stranan de, di helbestan de û di dilê gelê kurd de bijîn.*

NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA 1991

*HÊLÎN BAŞAK KANAT
*Ş. EVDILMELÎK ŞENGAL
*KEZBAN KIZILTOPRAK
*AYNUR ARTAN
*NURSEN ÎNCE (SARYA)
*ALÎ TEMEL
*KAMBER KAYA
*OSMAN YILDIZ

ÇAVDÊRÎ

## Li ser Kongreya Neteweyî



MIRHEM YIĞIT

Kongreya Neteweyî ev çend sal in munaqaşe dibe. Gelek rêxistin û şexsiyetên me beşdar dibin. Beşdarî ji her alî, dever, zarava, mezheb û dînên welat e. Îro piştî sê salan pir–hindik tê zanîn ka kî bi Kongreya Neteweyî re ye, kî ne pê re ye û kîjan rêxistin çendî ji dil e û çendî taktîkî yan jî stratejîkî li vê pirsgirêka neteweyî dinêre, têra xwe eşkera bûye û tê dîtin.

Ev bi serê xwe serkeftinek e. Divê mirov sipasî hêz û şexsiyetên însiyatîfgir bike. Ji ber vê însiyatîf û hewlê, dê dîrok bi qencî behsa wan bike. Kes û rêxistinên ku gavek li pêş û yek li paş in, çarçavî dibin, ji dijmin ditirsin û li dijî Kongreya Neteweyî ne jî, dê nav û sifatên layiqê xwe bigirin. Civîn, rûniştin ku heta niha hatin lidarxistin, zemînek çêkir û aliyên dilxwaz û ne dilxwaz, bibiryar û dudil ji nav hev derxistin. Rewş têra xwe zelal û sayî bûye, kî çi ye, dikare çawa bibe, bi xetên qalin ji aliyê gelê kurd û gelên Kurdistanê ve tê dîtin. Îro gaveke din divê. Ew jî di nav çend mehan de îlankirina Kongreya Neteweyî ye. Ji çalakiyên heta niha û ji tiştên hatine nivîsandin xuya dibe ku tendensa neteweyî xurt e û li welat û li derve gel piştgiriya damezirandina organekê seranserî dike.

Yên li pey zemên mane, muhafazekar û cangiran in hene. Bi taybetî li vir divê mirov navê PDK'ê bide. Ev partî ne bi tenê heta niha nekete civînên ji bo Kongreya Neteweyî, belê bi her awayî jî dixebite ku ew bi ser nekeve û ji bo vê jî çi kar dike. Kesê ku bala wî li ser rastiya gelê kurd e, hinekî xwedî kapasîte û xwedî karîn e, dikare bê dijwarî bibîne ku gelê kurd ji bo yekîtiyê ye û yên ku asteng in rêxistinên lokal, navçeparêz û ne serbixwe ne.

Em bi rastiyeke çendalî re rû bi rû ne: Li aliyekî Partiya Karkerên Kurdistanê û 13 rêxistinên kurd ji herçar perçeyên û bi sedan şexsiyetên kurd hene. Ev alî cidî ye, xwedî berpirsî ye û ji bo dezgahekî hevbeş bê damezirandin, ev çend sal in bê rawestan dixebite. Li aliyê din PDK bi serokayetiya malbata Barzanî heye. Ev alî hema bêje bûye beşek ji desthilatdariya dewleta tirk û xurtir kar dike da ku Kongreya Neteweyî ava nebe û heger bibe jî lê dixebite hejmara rêxistinên beşdar kêm bike. Aliyekî sisiyan jî heye ku qet xwe bi dilekî nake, di nav erênayê de ye, bi gotin hevalbend e, ne li dijî Kongreya Neteweyî ye, car caran dikeve civînan û mîna piştgirekî navendeke wiha berçav dibe, belê gava ku ser bi seriyê tê û êdî pratîk tê xwestin xwe dide paş, li gotinên xwe xwedî dernakeve.

Mirov dikare wiha jî bêje: Li aliyekî gelê kurd ku têrî xwe balix bûye, radîkal û hevgir e û serokativeke neteweyî ku jê re bûye rêber heye û li aliyê din hin program û hin siyasetên ku bi berjewendiyên gel re nagunçin (li hev nakin) û li pey gel mane hene. Aliyekî dimeşe û li hedefê nêzîk dibe û aliyekî ku dibe rêlêgir û kend û kosp li ser rê bûne rastiya roja me. Diyar e gel ji dê xwe ne li gorî siyasetên li duh mane, belê li gorî yên ku bi zemên re ne, xwe bi rê bixe û riya xwe bikudîne.

Di 19 û 20 ê meha 12'an sala 1998' an de li Brûkselê ji bo kongreya neteweyî civîneke durojî hate lidarxistin. Civîn ji awira hejmara rêxistinên beşdar û şexsiyetên navdar û xwedîgotin ve gelekî xurt bû. Munaqeşeyên hêja hatin kirin. Kes û rêxistinên amade, bibiryar bûn. Fikir û biryara hevbeş ew bû ku kongreya neteweyî gerek di nav sê mehan de heta Newrozê bê îlankirin. Wa diyar e di nav xelatên sala 1999'an de dê sembola yekîtiya kurdan Kongreya Neteweyî jî hebe. Ji niha de li me gişan pîroz be.

www.arsivakurdi.org

# Nivîskar Hesenê Metê: Divê nivîskar d

**Ziman bi qasî giringiya mirov bi xwe girîng e. Ji bo ku mirov bi zimanê xwe bipeyive, bixwîne û binivisîne ne pêwîst e ku meriv welatparêz, şoreşger û maqûl be, ne pêwîst e ku meriv rewşenbîr û pêşverû be! Ma tolaz û pêxasên xelkê jî bi zimanê xwe napeyivin?**

Hesenê Metê jînenîgariya xwe bo me wisa vegot: "Ez ne bawer im ku jiyaneke wisa balkêş li pey min hebe. Lê ku ez bi kurtî bibêjim, ez ji Erxeniya Diyarbekirê me û ev bi qasî hijdeh salan e ku ez ji wan deverina dûr im. Ji van hijdeh salan di sê salên pêşîn de dîtina çar perçên Kurdistanê bû qismetê min û ez li wan deverina jiyam. Aniha li Swêdê me.

Di warê wergêrî û nivîskariyê de jî min ji Pûşkîn Keça Kapîtan bo kurdî wergerand û di 1988'an de çap bû. Dîsa min û çend çîrokên xwe yên din, me her yekî çend novelên Çêxov wergerandin kurdî û di sala



1989'an de bi navê Mirina Karmend çap bûn . Wekî din hin kurtçîrokên gelêrî ku min şêweyekî edebî û hunerî hûnandibûn, bi navê Ardû di sala 1991'an de çap bûn. Dîsa ji Dostoyevskî romana bi navê Mirovên Reben min wergerande kurdî û ew jî di sala 1991'an de çap bû.

Dema ez çêlî berhemên xwe bikim; ta niha çar berhemên min hatine weşandin. Çend novelên min di forma pirtûkekê de bi navê Smîrnoff çap bûn, 1991. Bi navê Labîrenta Cinan min nivisandina noveleke dirêj qedand û di destpêka sala 1994'an de hate weşandin. Vê bihara borî jî dîsa çend novelên min di forma pirtûkeke bi navê Epîlogê derketin."

SERKAN BRÛSK /STOCKHOLM

*Bala min dikişîne ku tu di şûna peyva çîrokê de peyva novelê bi kar tînî, çima?*

■ Îro di nava me kurdan de ji bo vî şaxê edebiyatê, bêhtir peyva çîrok û kurteçîrokê bi kar tê. Lê ez ne bawer im ku bersiva novelê bide. Etîmolojiya peyva novelê ji zimanê îtaliya dema 1250'î tê û di wan deman de bi maneya nûçe û nûyînê bi kar hatiye. Piştî Decamerona (1350) Boccaccio ev peyv di lîteraturê de nav û cihê xwe digire. Navê novelê bi xwe jî yek ji wan problemên novelê ye, ku di nava xelkê de safî nebûye. Çîroka me masala tirkî ye, sagaya swêdî ye, fairy-taleya îngilîzî ye. Bi gotineke din, bûyer û lehengê çîroka me berhemeke kolektîf, berhemeke anonîmîtetê (gelêrî) ye. Lê novela ku em aniha behs dikin tiştekî din e. Li welêt xwende û nexwende îro tu ji kê bipirsî û bibêjî çîrok çi ye, ew dê ji te re behs bike û dibe ku ji te re çîrokekê jî bibêje. Wê çaxê tuyê baştir bizanî ku çîroka ku ew dibêjin û novela ku em behs dikin, du tiştên ji hev cuda ne. Taybetiyên peyva çîrokê di kurdî de çêjn û maneyek din e. Ne wekî vê novelê ye. Di çîrokê de hunereke arizî tuneye û yekî/e bi tena serê xwe ew neafirandiye. Hinekan ew çîrok afirandiye, hinekan ew çîrok kêm û zêde kirine, hinekan ew çîrok xweş û tekûz kirine û hinekan jî ew çîrok heta îro anîne. Loma jî bi baweriya min ev peyva çîrok ku em bi kar tînin ne ji bo novelê ye. Ez wisa dizanim. Çima em dikarin peyva romanê bi kar bînin û ne peyva novelê?

*Baş e. Ferqa çîroka kurdî an jî Çîrokên Hezar û Şevekê û vê novela Boccaccîo çi ne? Ma mirov nikare ji çîrokên kurdî re bibêjin novel in?*

■ Di çîrokên kurdî de jî û di Çîrokên Hezar û Şevekê de jî vegotinên forma novelê hene. Her bûyerek ku di Tewrat û Încîla pîrozwer de bi serê xwe novelek e û wekî noveleke hatine gotin. Lê di piraniya vegotinên wiha de cih, wext, estetîk, huner, stîl, form, lehengên wan ne diyar in, yên diyar dikarin werine guhartin, yên ku neyêne guhartin jî xwediyê wan tune ne. Berhemên anonîmîtetekê ne. Pirî caran ev anonîmîtetî ji çarçova gel û dewletan jî firehtir e. Tu dibînî ku çîrokek îslandî li Kurdîstanê jî bi kurdî hatiye gotin. Gur û Heft Karik ne tenê li ba me, lê tu dibînî ku li hin deverine dinyayê jî tê vegotin. Baş e, em ê çawa îzah bikin? Ku ez bi zimanê xwe, bi stîla xwe, bi hunera xwe, bi zanebûna xwe, bi felsefa xwe, bi daxwaz û nexweşiya xwe li ser cîranê xwe î serxweş bûyerekê binivîsînim, li aliyê din jî Ristemê Zal an jî fableke bi navê Dîk û Rovî heye, ma di be ku em navê van hersê vegotinan bi peyva çîrokê bibêjin. Ma ne divê ferqek hebe? Ferqa ku Boccaccîo jî bi Decamerona xwe kir ev tişt bi xwe ye. Çîrokên anonîmîtetiyê çîrokên şablonî ne, çîroka ku dapîrên me ji me re dibêje ji çîrokên şablonî ne. Lê novel tiştekî din e. mirov dikare bibêje çîrok gulîstanek mişt ji kulîlkan e. Bifikire ku novelîstek jî li newalekê, li peravekê, li çiya û zozanekî li gorî daxwaz û lezeta xwe ji xwe re qevdeke kulîlk dide hev û navekî lê dike. Lê ne maqûl e bibêje gulîstan. Belkî ferqa berbiçav jî ev be.

*Diyar e çi dirêj çi kurt, tu çîrokan an jî bi gotina te tu novelan dinivisînî...*

■ Belê.

*Labîrenta Cinan dirêj e. Ji rexnegir û xwendevanan hinekan navê romanê jî ji bo wê bi kar anîn.*

■ Rast e navê romanê jî pê dixînin lê ez wê wekî novel, noveleke dirêj dibînim.

*Tiştên ku dihêlin tu berhemeke dirêj ne wekî roman lê wekî noveleke bibînî çi ne?*

■ Ev bi xwe pirseke dûve dirêj e. Ne tenê dûve dirêj e her wiha zelal jî nebûye. Tevlihevî û aloziya di navbera novel û romanê de bi awayekî ilmî ne zelal e. Ne ku tenê di nav me kurdan de, di nava xelkê de jî ev wisa ye. Lê yek dikare ji xwe re tiştekî li hev bîne, binivisîne û navekî lê bike. Ew tiştekî din e. Lê ez behsa tiştekî din dikim, ez dibêjim di krîter û pîvanên ilmî de li ser ferqa roman û novelê û nemaze novelên dirêj serwextî û lihevkirinek tune ye.

*Ji kerema xwe dikarî van krîter û pîvanan hinekî din bidî xuyakirin?*

■ Çi roman û çi novel... ku em dirêjiyekê jî bi novelê bixin û bibêjin noveleke dirêj, her du jî li ser gelek mefhûmên(têgîn) muşterek ava dibin: Di formên kurtî û dirêjahiya xwe de, ji aliyê tevna(kurgu) xwe de, ji aliyê cih û wexta xwe de, ji aliyê pir û kêmhejmariya lehengên xwe de, pirî caran romanên kurt û novelên dirêj dişibine hev. Û îro ev her du şaxên lîteraturê(wêje) ewqas nêzîkî hev bûne ku, ne hêsan e mirov di navbera wan de cudahiyeke berbiçav bibîne. Pirî caran mirov nizane bê çima nivîskar ji berhema xwe re gotiye roman an jî novel?

*Çêbû. Li ser ferqa di navbera wan de tu çi dibêjî?*

■ Ez naxwazim tiştekî zêde bibêjim. Ji 1800'î û vir de gelek tişt hatine gotin û wekî ku min got, tiştên hatine gotin jî mirov pê serwext nabin ku ji xwe re têkin pîvan û krîter.

*Tu behsa 1800'î dikî...*

■ Ji Boccaccio û heta 1800'î novel jî bi wan ekolên wekî humanîzm, ronesans, klasîzm û romantîzmê re wekî forma xwe ya kevn didome, forma ku ji Decamerona Boccaccîo, ji salên 1350'î maye. Boccaccio novelên xwe bi formeke kurt nivîsandiye. Ev form heta 1800'î jî tê. Lê piştî wê nemaze di ekolên realîzm û naturalîzmê de forma novela tradisyonel(kevneşopî) deforme dibe û heta îro gelek formên nû û xweser jê derketine.

*Te çima xwe daye nivîsandina çîrokan an jî ez dîsa bi gotina te bibêjim novelan?*

■ Min pir dixwest ez helbestan binivisînim, lê min ew ruh û ew kubariya şaîriyê li ba xwe nedît. Min li dereke din jî behs kiribû. Novel, bi qasî romanê rê nade niviskar ku qelpî û zexeliyan bike, cêwî an jî hêwiya romanê ye, di prosayê de kakil e, xwediyê formeke şidiyayî û guvişandî ye. Lewma novel dihêle ku xwendevan zûtir û kûrtir têbigihêje, di prosayê de desthilatiyeke hunerî ye. Û belkî jî ji ber vê yekê ye ku min bala xwe daye ser vî şaxî. Cudahiya ku me behs jî dikir, ez dibêjim ev e.

*Rewşa vî şaxî, şaxê novelê di kurdî de çawan e?*

■ Ne tenê şaxê novelê, ez dikarim bibêjim di hemû şaxên lîteraturê de li ba me an jî di zimanê me de lawaziyek heye. Ku di nava civakekê de kultura xwendin û nivisandinê tunebe bêguman ev lawazî jî dê her hebe. Li gel vê lawaziyê jî çi şiîr, çi roman û çi jî novel di vî warî de çend kes hene ku ew dê navên xwe di rûpelên edebiyata kurdî de bihêlin. Ne pêwîst e ez ji niha ve wan navan bi lêv bikim lê çend navên ku hêviya siberojê bide mirov hene.

www.arsivakurdi.org

# ...nivîsînê de çikûs be



Hesenê Metê ji zû de li derveyî welêt dijî. Metê tevna berhemên xwe bêhtir li ser derûniya mirovan dirêse. Di vî warî de diyar e Dostoyevskî tesîreke mezin lê kiriye. Aliyekî balkêş ên berhemên Metê jî bi şêweyekî rasterê vegotina "pîrozeyên(tabû)" mirov û civaka kurd e: Dubendiyên şoreşgerî û mirovane, hesîdîna rojhilatiyan ya bo rojavayiyan, têkiliya mêr û jinan, nakokî û azarên warên ronakbirî û welatê xerîbiyê...

*Bi baweriya te pîvanên çîroka têkûz çi ne? Wekî tu dibêjî noveleke xweş çawa tê nivîsandin?*

■ Xweşiya novelekê tiştekî îzafî ango subjektîf e. Xweşî, li gorî pîvanên ruhiyeta xwendevaneke/î ye û pirî caran ji bo motîva(hêma) novelê tê gotin. Ji bo oldarekî motîva Xwedê û pêxemberan xweş e, ji bo yekî koçer motîva zozan û reşmalên şevên havînan xweş e. Lê ji motîvekê bêtir di novelê de motîvasyon cihekî girîng digire, ku em îro jê re dibêjin noveleke serketî. Ez naxwazim li vir reçete bidim yekî ku ew dê çawa novelekê bihûne. Bi reçete û şîreteke wiha mirov kopiya nivîskariyekê hînî hinekan dikin, ne tiştekî din. Lê çend tiştên girîng hene ku nivîskar û nemaze nivîskarên novelan divê xwe jê dûr bixin. Motîv çi dibe bila bibe, lê di nivîsandina xwe de divê niviskar çikûs be, sembol, figur û tiştên zêde nekurisîne novela xwe. Di nivîsandina xwe de, ne dost û ne jî dijminê lehengên xwe be, ji komentar û biryaran dûrkeve, ji pênûsa xwe nav û rengan li lehengên xwe neke. Girîngtirîn tişt jî ew e ku nivîskar her tim valahiyan di nivîsa xwe de bihêle, xwendevan raserî dudiliyekê bike da ku piştî xwendinê ew bi xwe têkeve lêgerîneke. Ev lêgerîn ruhê xwendevan dewlemendtir û ramanên wî firehtir dike.

*Ji bo ku rewşa karê xwendin û nivîsandinê di nav kurdan de baştir û geştir bibe, pêwîstî bi çi heye.*

■ Pêwîstiya me bi gelek tiştan heye. Dewlet, akademî, bal û kultureke pêwîst, xwendevan û gelek tiştên din. Û ji van tiştan gelek îro ne di destê me de ne. Tiştekî ku di destê de me de heye ruh û şiûr e...

*Wê çaxê jî ji bo ku kultura xwendin û nivîsandina bi kurdî di nav me de zêde bibe xuya ye pêwîstiya kampanyayeke xurt heye.*

■ Ziman bi qasî girîngiya mirov bi xwe girîng e. Ziman îdentîtetek(nasnav) e, hebûnek e. Ku tu ji min bipirsî, ev tiştên wiha bi darê zorê, bi kampanyayan, bi pereyan, bi şekiran nabe. Ku şiûr û baweriya mirov bi xwe tiştekî wiha nehewîne, kirin û çalakiyên wiha cesaretên qelp û çêkirî ne. Ji bo ku mirov bi zimanê xwe bipeyive, bixwîne û binivisîne ne pêwîst e ku mirov welatparêz be, ne pêwîst e ku mirov şoreşger û maqûl be, ne pêwîst e ku mirov rewşenbîr û pêşverû be....! Ma berdûş, tolaz û pêxasên xelkê jî

**Motîv çi dibe bila bibe, lê di nivîsandina xwe de divê niviskar çikûs be, sembol, figur û tiştên zêde nekurisîne novela xwe. Di nivîsandina xwe de, ne dost û ne jî dijminê lehengên xwe be, ji komentar û biryaran dûrkeve, ji pênûsa xwe nav û rengan li lehengên xwe neke.**

bi zimanê xwe napeyivin?!

*Mebesta min ew e ku tesîra enstîtu, akademiyên zimên, kovar, rojname radyo û Med TV li ser kultura xwendin û nivîsandina xelkê çawa ye.*

■ Ji ber sedemeke naxoş em ji warê xwe dûr ketin. Wê demê ez biçûk bûm lê xweş tê bîra min bavê min dengê Êrîvanê vedikir, diya min li stranên Kawîs Axa û Meryemxanê guhdarî dikir û pê re digiriya. Ew tenê radyoyek bû û îro dema ku tu behsa tesîra înstîtu, kovar û televizyonê dikî, bêguman tesîreke pir mezin li xelkê dike. Ne tenê tesîrekê dike, her wiha ji bo her ruhekî cihê serbilindiyê ye jî. Ji ber ku piraniya me kurdan îro bi zimanê xwe nikarin bixwînin, dibe ku dengê înstîtu û rojnamên kurdî negihêje tevahiya xelkê, lê tesîra Med TV tesîreke mezin û miqedes e. Miqedesî ew e ku pîrejineke bêsewad li gundê çiyayekî xalî dikare lê temaşe bike û jê fam bike. Ji bo xortekî unîversîtê serbilindiyek e ku spîkereke Med TV ji yeke alman û fransî ne kêmtir e. Ji bo zarokekî/e hîseke biçûkbûnê çênabe, ku çima bi zimanê dê û bavê wî televizyon tune ye. Ev hemû, ji kampanyayekê bêhtir ji bo xelkê alîkariyek e, ku xelk nêzîkî zimanê xwe bibe, pê bipeyivin, pê bixwînin û binivîsînin. Bi gotineke din, ji prosesa(pêvajo) kultura xwendin û nivîsandinekê re alîkariyeke pîrozwer e. Û ez bawer im li ser girîngî û miqedesiya Med TV gotinên zêde jî heram in.

*Guhertin û bûyerên ku di van salên dawîn de li welêt rû didin, tesîreke çawa li edebiyata kurdî dikin?*

■ Li welêt îro gund dişewitin, bajar dişewitin, mirov dişewitin, şerekî xurt heye. Bêguman ev hemû tiştên ku rû didin tesîra xwe li her kesî dikin. Ne tenê li nivîskar û hunermendan, çi baş çi xirab tesîra xwe li herkesî dikin. Lê hunermendî ne goşkarî ye ku mirov biçin li gorî lingên xwe siparîşa cotek potîn bikin. Ne tenê edebiyat, hemû babetên hunermendiyê afirandin e, çêkirin e, jîrî ye, estetîk e, daneke yezdanî ye. Ku çavên hunermendekî jê nebire ku ew dê li gor stîl û forma xwe heq ji tiştekî derkeve, ji xwe dest pê nake, nikare bike û divê neke jî. Beriya her tiştî divê ew hunermend bi xwe serwextî tiştekî bibe û biryara xwe bi xwe bide. Bi xwe biryara xwe bide ku çi bi çi awayî çêke, ne ku bi plan û projên destê duduyan. An na hunera wî dê bibe hunereke destê duduyan. Ev aliyekî çîrokê ye, aliyê din jî di karê nivîsandinê de her hunermendek xwediyê stîleke xas û arizî ye. An jî divê wisa be. Bi gotineke din ji bo noveleke min, hebûna du saxikan têra min dike û zêde ye jî. Di hûnandina bajarekî şewitî de tirsa min ew e ku yekî mîna min nikaribe bi ser bikeve. Bala xwe bidê, piraniya tiştên ku îro têne nivisandin dîrekt û îndîrekt pêwendî bi van bûyerên welêt re hene. Lê ez newêrim bibêjim bi awayekî hunerî ye an jî ew berhem bi ser ketiye. Û dibe ku ew bajarê şewitî, êşa wan kesên ku terkî war bûne, îro û aniha bi hunereke bilind neyê nivisandin. Ji bo hunereke bilind serekî silamet, ruhekî pêt û wexteke xas pêwîst e. Hêvîdar im ku hunermend dê hebin û rabin rojekê van bûyeran di çarçova hunereke bilind de bihûnin.

*Gelo bi vê hunera bilind di kurdî de çiqas berhem hene?*

■ Ku ez li ser zaravaya kurmancî bibêjim, di hinek demên dîrokê de maqûl hebûne ku tiştên bi çêjna hunera bilind nivîsandine. Îro jî hene û tên nivisandin lê ev tişt pir û pir kêm in, ewqas kêm in ku carina mirov dikeve gumanekê ku pê behsa edebiyatekê bike.

*Bi dîtina te, sedemên ku vê kêmasî û lawaziyê di edebiyata kurdî de peyda dikin, çi ne?*

■ Sedemên siyasî, civakî, kulturî û dîrokî bêguman ji sedeman sedemên sereke ne. Û ev sedemên sereke jî piştî wextekê sedemên dest û dereca duduyan peyda dikin, ku berterefiya wan bi nifş û sedsalan jî mimkûn nabe. Bihêle ez sedemeke pir girîng ji devê cenabê şaîrê me Ehmed Huseynî bibêjim. Di semînerekê de dibêje: "Di zimanekî de divê raman, peyv û hestên mirov bi hev re di harmoniyekê de bin. Raman, peyv û hest divê ji derekê, ji kaniyekê derkevin. Di berhemeke edebî de divê ev hersê fenomenên hanê ligel hev biguncin ku mirov bibêje berhem berhema wî zimanî ye. Ji lewre ev hersê fenomen zimanekî karakterîze dikin. Ev jî di roja îro de di kurmancî de têra xwe peyda nabe. Raman bi tirkî, hest bi erebî û tenê peyv bi kurdî be, bilindiya hunera berhemê jî ew dê tenê li gorî wê peyva xwe ya kurdî be." Ev yek, ku ez sedemeke din jî tenê ji bo îro bibêjim, ew jî stres û kompleksеke nivîsandinê ye. Ev jî rê li ber yekî digire ku xwe konsantreyî hunereke bilind bike û biafirîne.

# Welato!

**Welato! Dema ku bingeha parlementoya kurd hate danîn, pê re dilê 30-40 milyon kurdan bi şahî lê da. Ji sêsed salî ve ji heyamê Ehmedê Xanî ve gelê kurd li hêviya roj û parlamentoyeke wilo bû. Lê sed mixabin ku, ew hêviyên sêsed salî ji bo ezezetiyê bêne beravêtin li ber lingan û hêviyên ku dilê 30-40 mîlyon kurdan geş dikir bi carakê re bêne çilmisandin.**

Afirandina bê azadî ne tu afirandine, azadiya bêwelat ne tu azadî ye. Gelo rok heye bêwelat! Pêşeroj hene bêmirov; cih û war! Welato! Tu afirandin û azadiya min î, armanc û hêviyên min î, hebûn û nebûna min î...

**Welato!**

Qenc dizanim ku, tu ne kurkekî lixwekirinê yî! Nejî, êl û hozeke pesinandinê ye. Tu her tişt î, tu qedera min î, ez qedera te me... Bi ku ve birevim ez dê li te rast bêm, tu bi ku ve herî tuyê li min nast bêyî. Tu esmanên min nîn in, ji siha esmanê te pê ve û tu demên min ên xweş nîn in, ji biharên zozanên te pê ve. Siha esman û zozanê te yên min in, wekî ku yên her kurdekî dilsoz û welatparêz in...

**Welato!**

Carekê tenê rê bide min ku, ez bi navê te bîr û baweriyên xwe bêjim, tevî ku ez jî kurd im û her roj tîş tenê min ji ber kurdîtiya min. Rê bide min ku ez bi navê te, destê xwe dirêjî destê xelkê cîhanê bikim û ji wan re bibêjim ku ez jî mirovekî aştîxwaz im, wekî mirovên vê cîhanê bi xak, dîrok û ziman im; bi hêvî me û dil dikim bi serbilindî li ser xaka xwe bimînin û bijîm. Zerara min li kesî nebûye. Bi hêvî me zilm û zora xelkê jî ji ser min rabe û nemîne. Min mafê kesî nexwariye. Bi hêvî me, mafê min î windabûyî li min vegere. Ne neyarê kesî me, bi hêvî me kes jî neyartiya min neke...!

Her ez bi navê te diaxivim Welato! Ji sala 1514'an de, bi dehan şoreşên min hatine perçiqandin. Bi hezaran welatiyên min hatine kuştin. Şar û gundên min mane kavil û wêran. Sirgûnî û mişextî maye para gelê min, tevî ku dawiya çerxa bîstan e dem hatiye guhartin. Dem bûye dema demokrasî, aştî û tenahiyê. Ne ku ez bi vê demê û van mercan ne bawer im û ne ku ew mêranî li bal min nemaye, ku ez nema bikaribim dîrok, kultur û hebûna xwe biparêzim û kar jê re bikim. Bila kes bawer neke ku ez dê ji desthilanînê bikevim. Çawa ez dê ji desthilanînê bikevim, li pêşberî van kesên ku xaka min, dîroka min û kultura min dizîne û hê jî didizin?!

Vêca her û her ez dê dozdarê yekîtiyê bim. Ew yekîtiya ku gelê kurd wê di bin siya wê de navê min bilind bike. Çendî bîr û baweriyên têvel û cuda hebin ne xem e. Ji ber ku mirovên di malekê de dijîn, di bîr û baweriyên xwe de pirî caran ne wekî hev in lê tev ji bo navê wê malê kar û xebatê dikin.

**Welato!**

Ez bi navê te distrêm, bi navê te bêhna xwe berdidim, bi navê te xewnan dibînim û dinivîsînim. Ji ber ku Welato, tu strana min î, tu kezeba min î, tu xewn û nivîsandina min î...

***

**Welato!**

Ji çend rojan ve serê min di ber min de maye tewiyayî, di nav ponijîn û ramanan de mame razayî! Ken û girnijîn ji min dûr ketine. Gotin û peyv ji min reviyane, pênûs jî ji min xeyidiye...

**Welato!**

Ji mêj ve pêşiyên me gotine; ku ba hat keviran bidêrin, ku ba nehat guh bidêrin. Yê me kurdan tevî ku heyamê guhdêranê çûye, here û venegere, roj bûye roja kurdîtiyê û rêka kurdîtiyê berfireh ji me re hatiye raxistin. Lê mixabin ku di vê rewşê de berpirsiyarên me keviran bi ser hev de didêrin. Fatîhayan li ser canê hev dixwînin, xwîna mirovê kurd bi destê mirovê kurd dirijînin.

Gelo ma ne bes e ku ji ezezetiya xwe dakevin? Wekî bira destên xwe bi din hev, biryarên hevpişk bi hev re derînin, bi navê parastina dîroka kurdî ji windabûnê, parastina rewşenbîriya kurdî ji talanê, parastina zimanê kurdî ji zarokên kurdan re, parastina zarokên kurdan ji parsa bajarên ewrûpî û dawî parastina rûmeta gelê kurd di nav gelên cîhanê de.

**Welato!**

Ji wan re bêje; ku bêçek destên xwe bi din hev, bêçek bi hev re bigirnijin û bikenin. Ji wan re bêje Welato ku hema carekê tenê ji Xwedê bitirsin û li kul, êş û janên vî gelê hejar û perîşan biponijin.

**Welato!**

Ji wan re bêje ku dest kevirekî ji kevirên Kurdistanê nedin ku pê avaniyekê ava nekin. Pelekî ji darên Kurdistanê neweşînin ku, şitleke nû ji dêl ve neçînin. Çûkekê ji nav daristanê Kurdistanê nefirînin ku, hêlîneke bi star jê re nebînin...!


Ji wan re bêje Welato, ku dîrok ne kirasekî her yek li gorî dilê xwe ji xwe re bitefsilîne. Terziyê wî kirasî dem e, dem jî dîrok e, dîrok jî wekî deryayê tiştekî veşartî di nav zikê xwe de nahêle. Çendî bi dereng bi keve û dirêj be lê dawî ya rast her derdikeve û eşkere dibe...

**Welato!**

Dema ku bingeha parlementoya kurd hate danîn, pê re dilê 30–40 milyon kurdan lê da bi şahî, hêvîyên 30–40 mîlyon kurdan geş bû û wan got bijî bijî...!! Welato! Ji sêsed salî ve ji heyamê Ehmedê Xanî ve gelê kurd li hêviya rojeke wilo û parlamentoyeke wilo bû. Lê mixabin û sed mixabin ku, ew hêviyên sêsed salî ji bo ezezetî û kesayetiyê bêne beravêtin li ber lingan û hêviyên ku dilê 30–40 milyon kurdan geş dikir bi carakê re bêne çilmisandin. Ew kulîka ku nû dest bi pişkivandinê kiribû, bi destê mirovên kurd bê qurquçandin...

Em karbidestên vî karûbarî datînin ber berpirsyariya dîrokê, bê ka kî ji xweşî û serfiraziya gelê kurd re dixebite û bizavê dike, ew wê cihê xwe di nav dîroka gelî kurd de bihêle bi çak û rindî.

KONÊ REŞ/ QAMIŞLO



"Her ez bi navê te diaxivim Welato! Ji sala 1514'an de, bi dehan şoreşên min hatine perçiqandin. Şar û gundên min mane kavil û wêran. Sirgûnî û mişextî maye para gelê min, tevî ku dawiya çerxa bîstan e dem hatiye guhartin. Ne ku ez bi vê demê û van mercan ne bawer im û ne ku ew mêranî li bal min nemaye, ku ez nema bikaribim dîrok, kultur û hebûna xwe biparêzim."

(Wêne: Serhad Bapîr; Jina li nav gundê ku dê were wêrankirin)

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ

Navenda Çanda Mezopotamya ya Îzmîrê

● **03.01.99 yekşem:**

Konferans: "Şovenîzm û kedkarên Tirkiyeyê" Murat Akıncılar, saet: 18.00

● **08.01.99 în:**

Panel: "Li Tirkiyeyê qeyrana siyasî". Beşdar: MKM-HADEP, saet:18.00

YÇKM

● **2 rêbendan 99 şemî:**

Sehne ji NÇM'ê re: Çalakiya Navenda Çanda Mezhpotamya, saet: 15.00

● **3 rêbendan 99 yekşem:**

Pêşandanê slaytê û gotûbêj:

"Tenduristiya zarokên karker û rengê xebatê".

Pêşkêşvan: Îrfan Ertel, saet: 15.00

● **7 rêbendan 99 pêncşem:**

Konsera Koma Kızılırmak, saet: 19.30

● **8 rêbendan 99 în:**

Fîlmê Cîhana Avê (Wazer World). Lîstikvan: Kein Coster, saet: 19.00

# Ciwanan xwe li ber Agirê Zerdeşt germ kirin



Piştî meşa Romayê ya dîrokî, wekî hemû sazgehên kurd NÇM'ya Îzmîrê jî ji wan êrîşên dewletê yên bêsînor para xwe girt, di nava vê mehê de, polîsan du caran êrîş birin ser NÇM'ya Îzmîrê. Gelek xebatkarên NÇM'ê binçav kirin û birêveberên NÇM' ê Hamide Yüksel, Fadime Genç hatin girtin û ew şandin Girtîgeha Uşakê.

Li hemberî van êrîşan, NÇM çalakiyên xwe bênavber berdewam dike. Ji wan çalakiyan yek jî konsera Koma Agirê Zerdeşt a ku roja 27'ê berfanbarê hate lidarxistin e.

Koma Agirê Zerdeşt di salona NÇM'ya Îzmîrê de konserek pêşkêşî gel kir. Komê, nêzîkî sê sal berî niha li NÇM'ya Îzmîrê dest bi xebatê kiribû.

Agirê Zerdeşt, bi tarza muzika xwe, di nava demeke kurt de, bala gelek kesî kişandibû li ser xwe û bi tarza muzika xwe di nava gelek kesî de bûbû mijara nîqaşê. Hinekan muzika Koma Agirê Zerdeşt wekî muzîka kurdî ya nûjen, hinekan Rok, hinekan jî wekî muzika Rojava û hwd. bi nav dikir. Lê ev nîqaş ligel ku her berdewam in, muzîka ku kom çêdike bi piranî ji aliyê ciwanan ve bi baldarî tê guhdarkirin.

Koma Agirê Zerdeşt di muzikê de amûrên wekî Gîtara Akûstîkî, Gîtara Bas, Gîtara Klasîk, Batarî û Tembûr bi kar tîne.

Konsera Koma Agirê Zerdeşt bi beşdariyeke mezin hate lidarxistin. Salona NÇM'ê mişt tijî bû. Lewre gelek kes li derveyî salonê man.

### "Emê wekî gerîlayên çandê bixebitin"

Di destpêka konserê de endama komê Ozan Leman bi axaftineke kurt diyar kir ku, her çiqas dewlet êrîşan bibe ser wan jî, tu carî nikare rê li ber xebatên wan bigire. Hozan Leman wiha got: "Emê di qada çand û hunerê da wekî gerîlayên çandê têkoşîna xwe berdewam bikin.


Koma Agirê Zerdeşt di konsera xwe de nêzîkî bîst stran gotin. Piraniya wan stranên gelêrî bûn. Ev stran li aliyê komê ve ji nû ve hatine berhevkirin. Her wiha komê çend stranên xwe jî pêşkêşî ciwanan kirin. Koma Agirê Zerdeşt di dawiya konsera xwe de ji bo ku di pêşerojê de xwe xurtir bike û kêmasiyên xwe ji holê rake bi gotûbêjeke kurt rexne û pêşniyazên kesên ku beşdarî konserê bûyî xwest. Di wê navberê de bersiva hinek pirsên kesên ku beşdarî konserê bûbûn jî dan. Bi vê yekê bersiva pirsa tarza muzîka komê jî ji aliyê endamên komê ve hate dayîn. Endamên komê bersiva pirseke bi vî rengî wiha bersivand: "Me tu nav daneniye li ser muzîka ku em çê dikin. Daxwaza me ew e em muzîka kurdî bi hinek amûrên nû bi pêş ve bibin.

Bi xwestina ciwanan Koma Agirê Zerdeşt çend stranên govendê gotin û ciwanan dîlan û govend girtin. Li hemberî hemû êrîş û çewsandinan, bi gotina strana Rojbaş Gerîla carek din xwe dane ber agirê Zerdeşt û konser bi vî awayî bi dawî bû.

**DAWUT ÖZALP** /A.WELAT ÎZMÎR

## TÎŞK

# Salî Niwê



BEKIR ŞIWANÎ

Katêk em witare degate ber destî xwênerî hêja, xudahafîzîman le salî 1998 kirdiwe û pêman nawete rojekanî seretay salî 1999.

Mirov legel malawayîkirdin le salêk û pêşwazîkirdin le salêkî niwê da, sereta rûdawekanî jiyanî salî rabirdûy xoy û paşan dewruber û niştîmanekey û cîhanî dêtewe xeyal. Her rûdawêk be pêy giringî û bayexî xoy le serî radewestîn. Be ser awezman da cêgîr buwe ke natwanîn mafî xoy nedeynê.

Min lêre da rastewxo dême ser hendê rûdawî salî 1998 ke peywendî be hemûmanewe heye, yan rastir bilêm peywendî be çarenûsî netewekemanewe heye. Salî rabirdû komelê gorankarî û pêşkewtin le ser astî Kurdistan û nawçeke hatine arawe ke şêwazêkî tiriyan be kêşekey mîletekeman bexşî. Gûmanî têda niye ke giringtirîn gorankarî le sertaserî kêşey kurd da, hatinî Serokî Giştî PKK A. Öcalan bû bo Ewrûpa. Öcalan her xoy be tenya nehate Ewrûpa, belkû kêşey dirêjxayenî netewey kurdî be hemû derencamekaniyewe legel xoy hêna û be tewijim xistiye ray giştî nêwdewletiyewe. Öcalan be Ewrûpay wit: "Êwe berpirsiyar in le meynetî, malwêranî, qirkirdin, diwakewtinî gelî kurd û letupetbûnî welatekey." Bewperî biwêriyewe daway lêkirdin ke sinûrêk dabinên bo ew canewerey ke le amêzî xoyan da gewreyan kirdiwe. Her çende Ewrûpa hêşta be kirdewe hengawî nenawe bo çareserkirdinî kêşek kurd, belam hatinî Öcalan dewletekanî Ewrûpa û ray giştî le erkî ser şaniyan agadar kirdiwe û bo yekem car le Ewrûpa û be dengêkî bilind zengî kurd lêdra. Aşkira ye ke berubûmî hengawî siyasî desbecê nadûrêtewe, belkû katî dewê ta çiro derdekat û şîn dêbê û ber degrê. Helbete em witeye karîi diblomasî kurdîş degrêtewe. Kêşey kurd le diway hatinî Öcalanewe bo Roma, le qonaxêkewe berew qonaxêkî tir deçê, wate hêşta be tewawî neçûwe. Belam pêşkewtinekan wekû witman wa nîşan deden ke le salî niwê da kêşekeman rehendêkî tir le xo bigrê.

Rûdawêkî tirî giringî salî rabirdû aştbûnewey layenekanî başûrî Kurdistan bû. Paş çiwar sal şerî xwênawî herdû layen hatine ser ew bawerey ke çareser le lûley tifeng da niye û leser mêzî giftugo ye. Cêbecêkirdini rêkewtunî aştî başûr gelekeman le dozexî şerî nawxo rizgar deka û biwarî pê dedat pişuyek bidat û awir le awedan kirdinewey Kurdistan û komelgay kurdayetî bidatewe, çunke ew beşey Kurdistan talawî zorî dagîrkerî çeştiwe.

Em rêkewtine wekû zor carî tirîş witirawe destkewtêkî girîng e eger le berjewenî gel bixrête kar û le dijî bizûtnewekanî parçekanî dîkey Kurdistan nebê. Dekrê le salî niwê da layenekanî Kurdistan konfransêkî aştî bibestin û nakokî nêwan xoyanî têda çareser biken, ta hemû pêkewe û be yek deng daway mafe rewakanman biken.

Legel rêzî bê payanman da bo bapîran, ba legel hatinî salî niwê da ew pendeyan pêçewane bikeynewe ke delê, sal be sal xozgem be par.

www.arsivakurdi.org

# Destana Seyrê û Eliyê Mamed



Qasê jê re behsa qîzikê kiriye, mele ji dawam xwe de rabû piya, tizbiyek di stikura wî de daliqandiye, rahişte şehkê xwe ji bêrîka xwe derxist û bi riha xwe ket û û şkenandiye, zimanê xwe li dora devê xwe xistiye, kitêba xwe di bin çengê xwe de zemt kiriye, qevzê mele li pêşiya pîrê bûn weke qevzê pezkovî ye ax lo lo melawo.

Ewî qesta bin konikê pîrê kiriye, qasê kete bin konikê, sibhan ji rebê alemê, meyizandina ku meyizand, şewq û şemala davêje çol û çiyan, davêje ber behrê pişta gamasiya, kesî qîzê wekî wê nedîne li nava dewletê ejnebî ye. Mele çawa çoka xwe li ser çoka wê danî ye, ha Seyrê bêje heyal û huzrana te çi ye?

Seyrê bi rimkê qevistiye. Bi rebê alemê tu dibê qey wî navka diya Seyrê biriye, tu nabê pîrê navê wêna jê re gotiye.

Seyrê go Seyda de hê ye, ezê bi dev ji te re bêjim, jixwe xema dilê min porkûrê tu qelemê bavê ser wê kaxetê ye, lo lo melewo.

Melê bang kirê go Seyrê de hê ye ezê pirskê bêjim li neqeba xwe û te li bin konê pîrê ye. Tu zane ku destê min nagire qelemê ye, awirê min nahêle ji kaxetê ye, go ramûsanke bike ji boqazê li bin konê pîrê ye. Belkî hema hêvî Xwedê hişê min bigre qelemê, awirê min bibire ji kaxetê ye, lê lê Seyrê, ax lê nemayê.

Seyrê bang kirê got Seyda de we ye, gotin û galgal bê fêde ye, agir bi mala bavê te neketo, ka binivîse ezê ramûsankê–duda bidime te ye, lo lo melawo, lo Seyda wo. Seyrê bi dev jê re gotiye, melê qelem li ser kaxetê bir û aniye, hingî hisê wî li ser keçkê, hes herêma Xwedê be, ji çarde herfa yeke sax tê de nedaniye, lo lo melawo, lo lo seydawo. Seyrê gotiyê, go seyda de we ye, ew kaxeta ha ji destê birayê min î biçûk ji destê min ji destê Qor Silêman e.

Qasê kaxet reş û mor kiriye, ha go destê xulamkî sê zêr berdane ser destê wî ye, wî rê bi kirê welatê Hesen û Heyderan ya Elah ya Xwedê welatê Hesen û Heyderan tu li ku ye?

Seyrê halo meyizand da melê dewa ramûsanan lê kiriye. Seyrê çavê xwe gerand, destê xwe avête ferşikekî ji wa yê piraxa, qenc bi qîmê di bin çoka xwe de daniye. Seyrê bang kirê got hewce nîn e, kerem bike xwe baskî min de bitewîne, hey dinya virek e derewîn e, ramûsankê ji kula ji xeml û xeyalê dilê xwe re tu bistîne hey lo lo.

Melê xwe baskî tewandiye, weke rovî xwe di nav lepê wê de xilûxavî kiriye, ewê qenc bi qîmê destê xwe avête stkura wî ye, destê xwe avête wî ferşikê piraxa got peleq di nav çavê melê de xistiye, çavek derxist, yek mayiye, bi pişta berstûka wî girtiye, kişande ser ting, bang kir ew kûçê konî ye, timamê kûçkê koniya li ser laşê mele vehewand, şibandin termê kera û çêleka lo lo melawo.

Pîrê ji dawma xwe de rabû bi pişta berstûka wî girtiye, wî li konkî–duda zîvirand, bele ji devê deriyê xwe da alî ye.

Seyrê go ya Elah û ya Xwedê da ser rê û meşiya, kete Gelyê Kersê, Gelyê Dûdê li deriyê şkeftê rûnişt li halê xwe gotiye hey lo lo. Seyrê got li min Seyrê li min nemayê, li mi destê li ber rûwayê, şermika welatê Hesen û Heydera, ezê li xwe heram kim, ax û ava hemû mesken û hemû giha lê lê Seyrê ax lê nemayê.

Birayê biçûk Qor Silêman bang kire herdu birayên xwe û got keko de hê ye, derdê min zewaca dinyayê eman ji derdê wê pûşta xwiha me Seyrê ye.

Çawa keko?

Heçî kurapê me bû, zaro bû, xeşîm bû, nû xeta simbêla rast kiribû, haya wî ji tu tiştî tunebû, xwihka me bi çembilê wî girt û revand. Mane ji welatê Hesen û Heydera xwînî bû, terqaha diçe go xwe li konê kirîvê me Hiseynê Dobelêl girtiye, tiştê ku Hiseynê Dobelêl kiriye, bi çembilê wê girtiye li pişta xwe girtiye, aniye neqeba Gelyê Kersê, Gelyê Dûdê, Gelyê Simoqê serê Şebaba hersê geliya daniye, keko piştî vî qasî nizam ne sax e, ne mirî ye, ev meh û nîva wê qediya, dibêje pirsa wê bi, ji nav konê Sihûkê şemiriye.

Qasê Qor Silêman biçûkê biran ev gotin û galgal ji her du bira re gotiye, bang kire wan, got keko de we ye, hûn her du bi zar û jin in, nasir in li ser mala xwe ne, ezê rabim biçim heyfa kurê apê xwe ye.

Mistefê lê kire qêrîn. Got: "Keko!" Got "çi?" Got: "Daweta bi hev re xweş e. Tu zaro yî, xeşîm î, tu nû xeta simbêla rast dikî, emê rabin biçin li kodika sîniya valaxînin, ya emê bi din, ya bistînin."

Bavo dilê min dilkî digote, hersê xweşmêr siwar bûn bûne cot e, yek şêr e, yek ezraîl, yek destbirakê melkemot e, roja qal û qewlikê giran belê kup li ber kurên bavan dikine rote lo lo de lo hey lo lo.

Va hersê xweşmêra bêvil li kêrê anîne, ya Elah û ya Xwedê ketine binê hawinga Leylana Çol Biriye, li Xirbê Xezalan li Şûva Reşan qulip-tiye, di ser Bîra Gurgurî re derbas bûn, li ser Bîra Şerefdîn vergerîne, belê ketine bin konê kirîvê xwe Hiseynê Dobelêl, Hiseynê Dobelêl şîva wan li ber wan daniye.

Ew hersî xweşmêr rabûne piya, konê wî diket miqabilî konê wî ye, çûn li ber dera konê wî sekinîne. Qor Silêman birayê biçûk got çip û bi peya bû, bû kelemkî diritê kete singa herduka wa keko? Got: De hê ye. Bi rebê alemê heta ku hûn min nekujin heta sax bim li heyatê ye, yek ji we ji vê derê nalebitê ye hey lo lo.

Ew li aliyê reşê di nav şekalan de rûniştiye, meyizandina ku meyizand rabû piya, bang kir go wa Îskano go çi ye, agir bi mala bavê te neketo, go gelo te ew xortê pêşkêşî bi fesal, bi hezn û cemal kuşt, Seyrê nebû qismetê wî gelo kes nezane ne sax e, ne mirî ye, niha hinka ji xwe re biriye hey lo lo.

Qasê wilo got Îskanê Gulîxanê malikşewitî ji dawma xwe de rabû piya, bû xîze xîza qirka wî sebîlê ji vî rexî dadigire, heta ji vî serî diçe wî seriyê din qijîn ji binê wê tê, çar hilma lê dixe qijîn ji binê wê anî ye, li vê ecêbê ka wî bi saxî bînin ber vî lepî ye, min bi zor ji bîra kiribû dîsa kirin kul û keder xistin ser vî dilî ye hey lo lo.

Ewî go xir û li devê deriyê konê bazdayî ye, bi milê wî girt û li ser doşekê daniye.

Qor Silêman birayê biçûk rabû piya, hat ev gotin û galgal ji her du biran re gotiye.

Mistefa bang kirê got keko got hê. Got: De yeqîna te bê ji Xwedê di wê kêliyê de go ez bedêla te bûma minê hicûm bikira di odê de delo lo lo ax lo hey lo lo.

Ewî bang kirê got keko de we ye. Zêr hewqas, mecîdî jî hewqas e, aqle min ne aqilê we ye, aqile biçûkan, ne ji meznayî ye, xatir ji herdu bira xwest û wesyeta xwe li wan kiriye, çû di aliyê reş di binê kon de rûniştiye, ji vir û pêve civata wî bû çare–çar pênce–pênc belav bûye.

Meyizandina ku meyizand Îskanê Gulîxanê loma pêve nemayiye, xulamek şande aliyê malê, anî berîkî Çiyayê Şengalê hejîrê Çiyayê Spî, bi qasî qama zilamkî ye, ketine ser fêkiyê xwe xwarine, xulamkî bi sîleh dabû pey wî ye, yekî dabû pêşiya wî ye heta çûn aliyê çîtê aliyê malê rexê dî ye. Qor Silêman birayê biçûk got wey li min û bavê min heram be, çawa wî di ber sînga xwihka me de kurê apê me kuştiye go di neqeba pîrekê wî de wî bikujim. Wey li min heram be kuştina wî ye, lo lo de lo ax lo hey lo lo.

Ew di cîkê xwe de rûniştiye, meyizandina ku meyizand, xulam di cihê xwe de bi xew ve çûyine, ew çû rexê dî ye. Dêhna xwe bidê Qor Silêman biçûkê bira rabû piya, teqib kir çû aliyê malê ye, rexê dî ye. Meyizandina ku meyizand ku ketiye neqeba herdu pîrekê xwe, xir xir li qirka wî ketiye, lê deng nekir heta qenc bi qîmê raza-yiye, hey lo lo hey lo lo.

Dêhna xwe bidê Qor Silêman got çip û qulipte koza wî ye, mîrata esfûyê tûj e, mîna şûjin û derzî ye, nîvê esfûyê bi jehra Silêmanî kelandiye ku kurê bavan davêje qebra tarî ye.

Ewî esfû avête bin qirka wî ye, serê wî jê kir bi destê xwe girt û li pişta şîtê sekiniye, weke zarok bi xwînê bilîzin, li bin guhê herdu pîrekên xwe ketiye, keko were ferca paqê tazî ye, ax lo lo de lo lo.

Pîrekan xwe avête ser laşê wî ye meyizandi-na go meyizand serê wîna bi destê wî ye, ewî go xirp û ling xistiye, li ber herdu biran serê wî weke kundurkê ji yê xerab, go rep û li erdê xis-tiye.

Bavo dilê min dilkî digote, hersê siwar bûbûne cot e, yek şêr e, yek cebraîl e, yek dest-birakê melkemot e.

Mistefa birayê mezin got hey lê hey lê lê em birayê Seyrê ne, pismamê Eliyê Mamed in ji Welatê Hesen û Heydera em hatin heyfa wî ye, me serê Îskanê Gulîxanê jê kir, li warê Heyderî ye lawo dewe, îştê serê kurê bava camêra ye, hek emê li xwe biqelibînin, dûrî meydana kerkelêşa aniha maye hey lo de lo lo.

Çendekê go hişyar bûn, gotin elhemdûlilah em xilas kirin ji lepê vî gawirî ye. Ewa lêxist û vegeriyan hatin bin konê Hiseynê Dobelêl serê wîna go kurp û li erdê xistiye, ewî go mirç mirç hat aniye wan maç kiriye, heçê daweta mezin vêca daweta diya wî ye.

Ewî deng hersê kurê xwe kiriye, daye pêşiya wan e, ya Elah û ye Xwedê ketine neqeba Gelyê Kersê, Geliyê Dûdê, Serê Şibaba hersê geliya.

Eman bi rebhe aleme saetek mabû ji sibê re me li vir danî, piştî vî qasî em nizanin ne sax e ne mirî ye, pirsa wê bikin hey lo lo lo. Ewa xatir ji wan xwest û vegeriya bavo de wa ye, Xwedê teala namûsê bide, namûsa kurê bavan ji ba Xwedê ye.

Qor Silêman birayê biçûk li paş mayiye, mey-izandina ku meyzand im im û nalîn tê ji geliya, derbas bî vî rexî deng tê ji rexê dî ye, derbas bû rexê din deng tê ji rexê dî ye. Mexlûm e de ne dengê wê li hevdû geriyaye, li herdu rexan êşandiye, meyizandina ku meyizand weke reşkî li deryê şkeftê rûniştiye, meyizandina ku meyizand, însaneke bazda ji deryê şkeftê bi talya şkeftê de çûyiye, ev car mûmeke wekî fenerê pêxistiye, bi talya şkeftê de beziya çû bi guska milê wê girt û derxistiye, qasê herdûka çav li hevdu kir, qêrîna wan çû erşêbanî ye hey lo lo.

Seyrê bang kirê got keko ev çi dewre çi dewran e? Ji bona xatirê Xwedê te digo qetla min li te helal be hey lo lo bira lo.

Ewî bang kirê got xwihê de hê ye. Ji zemana heta niha qedera rebê alemê li aniya xwiha me nivîsîbû li darê dinyê ye. Ewî got ezê rihê xwe bikim berdêla rihê xwiha xwe Seyrê ye lê lê Seyrê, lê lê nemayê.

Seyrê bang kirê got keko payiz e, mîada tirî ne kenê min tê qet ne girî ji bona xatirê Xwedê mi mebe ba Mistefê wî gawirî lo lo bira hey lo lo keko.

Ewî bang kirê got xwihê go de hê ye, Xwedê fermana min raneke, Xwedê rihê min nestîne, ezê rihê xwe berdêla rihê xwiha xwe bikim li darê dinyê ye, qasî xwe berdan nivê gelî ye, Qor Silêman bi çeplê Seyra Gulîsor girt û li pişt xwe daniye hey lo lo lo hey lo lo hey lo.

Mistefê birayê navîn bang kirê birayê mezin go keko, go libê çi ye, go bi rebê alemê min nizanîbû dilê dila wê her ser qîzika yezîdî ye, vaye kirîvê min Hiseynê Dobelêl hêdî bi hêdî li xanê peya bûye hey lo lo lo hey lo lo hey lo.

Ewî bang kirê go keko de hê ye, qesta min xwihka me Seyrê ye.

Qasê behsa Seyrê dikê ye, Mistefa birayê mezin destê xwe avêt demançê ye, Qor Silêman jê re got keko ma çê ye got bi rebê alemê ê ku tiliya xwe bi xwiha min veke, ezê rihê xwe bikim bedêla rihê Seyrê ye, ema ev der çola Xwedê ye lo lo de lo lo birayo.

Mistefê bang kir got keko de we bê, li min soz û li min ahbedê ji vir û ha de rûnê cihê edebê tiştê go vê dêlê vê qasê li darê dinyayê, keko bela xatirê herdu çavê te bê lo lo bira lo lo keko. Ewan lez kir lezandiye, ya Elah û ya Xwedê welatê Hesen û Heydera tu li ku ye.

Ewa mil daniya ya Elah û ya Xwedê terxîn li welatê Hesen û Heydera aniye hê nû ketine ser kêfê ser xweşî ye.


Seyrê bang kirê got keko dem e li min dem e li ser pişta destê min heye saet û nemrem e, keko bi rebê alemê tu sê jina, çar jina bînî ez jî bindara birayê xwe me lo lo bira, lo lo keko.

Ewî bang kir got xwihê dil nadê wey li min û bavê min heram be heta tu ji zewaca kurê bava nexwazî, eman balgiyê keçê bavan li min heram be lê lê Seyrê lê lê nemayê. **(Qediya)**

BERHEVKAR: EVÎN RONÎ

www.arsivakurdi.org

# Hejmara Jiyana Rewşen a dawiya 98'an derket




Her çiqas kovar û rojnameyên kurdî bi naveroka xwe têr tijî nîn bin, bi karên ku hilgirtine, li gorî dil ranebin jî bi çalepikî bimeşin jî wekî her warê têkoşîne di wan de jî perisîn û nûjenbûnek li dar e. Yek ji wan weşanan jî Jiyana Rewşen e.


Di hejmara Jiyana Rewşenê a meha berfanbarê de li gel nivîsên ku kovarê dişibînin kovareke lêkolînî gelek nivîsên têvel ên wêjeyî cih digirin.

Wekî her hejmarê di vê hejmarê de jî Feqî Huseyn bi nivîsa xwe ya portreyî jînenîgariya helbestvanê kurd Şêx Eskerî (1899–1952) tev dide. Kawa Nemir guhertoyeke (varyant) Destana Gilgamêş ji Îngilîzî wergerandiye kurdî. Medenî Ferho di nivîsa xwe ya bi sernavê Civaka Entelektueliya Kurdî û Reformizm de bi arastekirina pirsa bi rengê, wêjeya kurdan qonaxa embiriyomê derbas kiriye gelo? rewşa wêjeya kurdan dadihûrîne.

Her wiha Felat Hebûn bi çîroka xwe ya bi navê Hawar, Harbi Soylu bi serpêhatiya xwe ya bi navê Rewşen, Teatra Jiyana Nû bi ceribandina xwe ya bi navê Nameyên Ji Êgir kovar rengîntir kiriye. Dîsa di vê hejmarê de gelek helbest, lêkolîn, werger cih digirin û hevpeyvînek bi koma muzîkê Vendîdadê re hatiye kirin.

SERWÎSA ÇANDÊ

# Ji Nûbiharê li ser dîrokê hejmareke dosyayî




Du hejmarên (66/67) kovara Nûbiharê bi hev re hatine weşandin. Ev hejmar bi giranî bi nivîsên li ser dîrokê hatiye dagirtin, lê hindek nivîsên din jî di nava rûpelên kovarê de ji xwe re cih dîtiye. Jixwe di pêşeka kovarê de hatiye ragihandin ku dê hêjmarên dosyayî ne her meh, çend mehan carekê bên weşandin. Ev biryara li ser daxwaza xwendevanan û demxuriya amadekirina dosyayan hatiye girtin.

Nivîsa yekemîn ji hêla Süleyman Çevik ve hatiye nivîsandin. Çevik di vê nivîsa xwe ya di bin sernavê "Destan bingeha dîrok û edebiyatê ne" de li ser têkiliya dîrok û destanan radiweste. Ew dide zanîn ku destan hin caran ji bo ronîkirina bûyerên dîrokî dibin alîkar û ji bo vê yekê jî destana Îlyada ya Homeros wekî mînak tê derpêşkirin.


Nivîseke din ku li ser dîroka kurdan radiweste, ji hêla nivîskar û dîrokzan Torî ve hatiye nivîsandin. Ew jî li ser binyata kurdan û rêbaza lêkolîna dîroka wan hin agahiyên rênîşandar pêşkêş dike. Nivîsa sêyemîn bi sernavê "Li Diyarbekirê Hikûmeta Dostkî û Merwanî" ye. Ev nivîsa ku ji pirtûka M. Emîn Zekî cilda duyemîn, ji rûpelên 95–101 hatiye wergirtin ji hêla Mela Emîn Heyderî ve hatiye amadekirin û qala serpêhatiya avabûna dewleta Merwaniyan û damezinerê wê Mîr Baz dike. Nivîsa paşîn a li ser dîrokê ji hêla Xelîl Dost ve hatiye nivîsandin û çelî "Şerefname û girîngiya wê" dike.

Ji bilî van nivîsan hindek kesên din jî bi pexşan û helbestên xwe bûne mêvanê vê hejmara kovarê.

SERWÎSA ÇANDÊ

# Ker çû seferê, hat ew kerê berê

HASAN KAYA



Di gelek ofîsên karbidest û burokratên kurdan de, tê axavtin ku piştî ku Yalım Erez bibe serokwezîrê dewleta tirk, ewê di heqê pirsgirêka kurdan de hinek guherînên baş pêk bîne. Ev camêrên ku wiha difikirin, teoriya xwe bi van gotinan dipeyitînin: "Hikmet Çetin serokê meclisê ye û kurd e. Yalım Erez jî kurd e. Her du jî li hemberî kurdan ne tûj in. Hikûmeta ku were avakirin dê ji teknokratan pêk were. Ev hikûmet zêde guh nade berjewendiyên siyasî. Ew dê hinek guherînên radîkal pêk bîne û cihê xwe bide siyasiyan..." Belê ev camêr bi vî awayî delîlan tînin û dibêjin jixwe daxwaza generalan jî çareseriyeke bi vî awayî ye.

Ev teorî mîna xewneke xweş dixuye. Lê yên ku karekterê dewleta tirk ji nêzîk ve dinasin zû bi zû ji ihtîmalên wiha bawer nakin. Emê bi hev re qewmînan bibînin.

Gerçî Yalım Erez di salên 1994–95'an de, dema ku Serokê Yekîtiya Ode û Borsayên Tirkiyeyê (TOBB) bû lêkolîneke dorfireh û dûvdirêj dabû çêkirin. Perene zêde lê dabûn. Ji bo amadekirina vê raporê jî Doğu Ergil hatibû tayinkirin. Ez dixwazim hinekî kurt be jî qala vê raporê bikim. Navê raporê "Tesbît û Teşhîsên Pirsgirêka Rojhilat" bû. Her çiqas navê raporê Pirsgirêka Rojhilat hatibe danîn jî kesên ku pirs ji wan hatine kirin navê pirsgirêkê rind lê kirine: "Pirsgirêka Kurd".

Anket bi 1267 mirovî re hatibû çêkirin. Li Mêrdîn, Amed, Batman, Edene, Mêrsîn û Antalyayê hatibû çêkirin. Piştî ku amadekirina anketê qediya û ji aliyê Doğu Ergil ve ev xebat wekî raporekê bi awayekî subjektîf ji raya giştî re hate eşkerekirin. Wekî mînak di hemû manşetên rojnameyan de cih girtibû ku gelê herêmê bi tenê ji %3.6 daxwaza dewleteke serbixwe dike, lewre nîsbeta piştgirên PKK jî ewqas e.


Helbet ev tahrîf bû. Ev pirs wiha hatibû kirin: Rêxistin (PKK) dikare kîjan armancên xwe pêk bîne? Li gorî rapora ku hatibû amadekirin, ev pirs ji 1267 mirovan hatibû kirin û bersiv bi vî awayî hatibûn dayin: 361 (%28.5) kesî bersiva vê pirsê nedabû, 29 (%2.3) kesî gotibû dê mafê çandî bi dest bixe, 52 ( %4.1) kesî gotibû dê mafê siyasî bi dest bixe û nasnameya kurdî bide pejirandin, 45 (3.6) kesî gotibû dê dewleteke serbixwe ava bike, 33 (%2.6) kesî gotibû dê federasyon+otonomiyê bi dest bixe, 20 (%1.6) kesî gotibû dê komara tirk demokratîk bike, 27 (%2.1) kesî gotibû dê civak û dewletê nebaş bike, 177 (%14.0) kesî ji bo hemû şiqê jorîn bersiva erênî dabû, 81 (%6.4) kesî hinek tiştên cihê cihê gotibûn, 142 (%11.2) kesî gotibû 'em nizanin', 202 (%15.9) kesî gotibû dê mafê siyasî û çandî, 31 (%2.4) kesî gotibû mafê çandî siyasî û dewleteke kurd bi dest bixe, 67 (%5.3) kesî jî gotibû dê mafê çandî siyasî û demokrasiyê bi dest bixe.

Dema ku em li vê tabloyê dinêrin û ew manşetên wan rojan têne bîra me, helwesta Yalım Erez a rojên bihurî ji helwesta wî ya pêşerojê re dibe nîşan. Lewre ev xebat a ku wî dabû çêkirin û ev reqemên ku min li jor rêz kirin, ji wê raporê hatine hildan. Lê Yalım Erez ne li raporê xwedî derket û ne bû xwediyê soza xwe, ne jî raportorê zanyar(!) Doğu Ergil li gorî rastiya vê raporê çek û dûzan da xwe. Di şûna wê de, Ergil heta jê hat guhên xwe ji dengên ku ji anketê dihat re girt. Li gorî namûs û rûmeta zanistê bi rê ve neçû. Gel di rapora wî de çi gotibe, wî li dijî wê helwest nîşan da. Heta îro jî ew li dijî wê realîteyê dimeşe.

Heke Yalım Erez poşman bûbe û guhê xwe bide wê rapora ku beriya niha bi çar salan dabû amadekirin, wê demê ev gotinên ku têne gotin bi serê min dikevin an na " ker çû seferê, hat ew kerê berê"...

www.arsivakurd.org

# Çîroka Apê Mûsa



Sal 1991 bû, li Tirkiye û li bakurê welatê me wê hilbijartin çêbûya. Partiyan teva xwe ji hilbijartinê re amade dikir. Yek ji van partiyan li Partiya Keda Gel (HEP) bû. HEP'ê çalakiyên xwe yên bi girseyî li çar aliyên welêt pêk dianîn. Rojekê ji van rojan Apê Mûsa,Leyla Zana û hinek xebatkarên partiyê diçine Cizîrê. Li qadekê bi deh hezaran gelê Cizîrê kom dibe.

Leyla Zana û hevalên wê ji gel re axaftinên xwe dikin û dorê didin Apê Mûsa. Apê Mûsa radibe ser piya û destên xwe radike hewa û dengê xwe berdide, dibêje: "Gelê Cizîra Botan hûn tev de bixêr hatin.!" Gelê Cizîrê bi çepik û dirûşmeyan bersiva Apê Mûsa dide. Apê Mûsa dibêje: "Ez naxwazim îro axaftina xwe dirêj bikim. Ezê îro çîrokekî ji were bibêjim. Rojekê ji rojan çûka beytîk şîreta li çêlîkê xwe dike, dibêje: 'Heçî mirov in dijminê me ne, heke rojekê mirov rastî we hatin û wê dît ku xwe tevandin erdê, zanibin ku wê rahêjin kevira wê bavêjine we, da ku we bikujin.' Çêlikeke beytikê ji dayika xwe pirs dike: 'Dayê pir baş e lê ku kevirên mirovan di bin çengê wan de bin, emê çi bikin?' Çûka beytîk bersiva çêlika xwe dide: 'Keça min heke hûn gihabin vê hedê ji xwe ne hewce ye ez tu şîretan li we bikim.' Demekê ez pêşkêşê we bûm. Lê niha hûn hemû zane bûne û hûn êdî dizanin ji bo felatiya we çi pêwîst e, vêca ne hewceyê ez dûr û dirêj bikim. Bi xatirê we ez ji we re serkeftinê dixwazim."

ÖMER HAYYAM

## Tu yê bibî çi?

Rojekê du kes tên ba hev. Yek ji wan karker e, yek jî xwendekar e. Yê xwendekar henekê xwe bi yê karker dike û jê dipirse:

– Ka tu çi yî?

Karker dibêje:

–Hîç

Karker jê dipirse:

– Tu çi yî?

Xwendekar bersivê dide:

– Ez xwendekar im

Karker:

Tu yê bibî çi?

Xwendekar:

– Mamoste.

Karker:

– Bi dû wê re tu yê bibî çi?

Xwendekar:

– Ezê bibim Doktor

Karker:

Lê bi dû wê tu yê bibî çi?

Xwendekar:

– Profesor

Karker:

– Lê bi dû we re tuyê bibî çi?

Xwendekar diponije û dibêje:


– Hîç

Karker dibêje:

– Ba hev tu yê ewqasî bixwînî bibî hîç, ez ji niha ve hîç im.

BERHEVKAR: EMÎN BOZAN

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (153) XAÇEPIRSA




### Bersiva Xaçepirsa 151'yê

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 153'yan pirtuka Feqiyê Teyran "Ey avê av" e.


**Jêrenot:**

*Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.*

**DÎWANA**

**Feqiyê Teyran**

**ey avê av**




**Pênc kesên ku xelata 151'ê pirtûka Faqiyê Teyran 'Ey avê av' qezenc kirine:** Hêlîn Doğan/Skenderûn, **Îsmail Temel/Mêrsîn,** Nûrî Dikmen/Stenbol, **Celal Yılmaz/Meletî,** A.Mecit Çetin/Mêrsîn.

www.arsivakurdi.org

# Qaşo Alternatîfê MED–TV

Şarê kurdî kanco cay de (warî de) raver şoro dewletey tirkî ewca de qeybî vernê raverşiyayînê şarê kurdî bigîro alternatîfan virazena. Demo peyîn de zî semedê vernî MED–TV'î bigîro televîzyonê ke bi destê Mesûd Barzanî ronena.

Heta ewro dewletey tirkî bi rey çapemeniya xo her gam şarê kurdî, şarê tirkî û şarî bînî xapênay. Bi destpêkerdina tekoşîney şarê kurdî ra heta ewro di çapemeniya xo de her gam kurdî zey terorîst bi name kerdî.

Gorey zagonanê çapemenî ra, çapemenî gere gorey şaran re reyra şoro û rastî çibo gere ay bi rastî veco orte. La di Tirkiya de çapemenî li gorey rastî ra nê, li gorey iktîdarî ra reyra şina û bi fekê dewlete xeber dana. Bi akerdinê televîzyonê Med'î ra dewletey tirkî waşt ke vernî televîzyonî bigiro û şarê kurdî yê televîzyonî temaşe nêkero. Di miyanê vernî girotinê yê de enî bibî: "Sînyal şirawtin, destserkerdina antênanê şarî û zn." Ewro jî bi awayke bîn wazena vernî televîzyonê Med'î bêro girotin.

Verî ko merdim rewşey ewroyîn biyaro serê ziwanî, gere merdim henî bewno dîrokey dewletey tirkî ra heta nika çi alternatîfî vetê werte.

Dewlete di dîrokey xo de di wextê şerê Agirî de ay û rêxistiney Xoybûnî gelê ke şerê çapemenî kerdo û hemverê jobînî de gelêke belavokî day ray şarî. Reyna di serhewadayinê bînan de jî bi ray çapameniya xo serokê serhewadayinan zey terorîst û heniyan jî zey esrarkêş, nîşan day. Bi şerê kurdan ke nika zî hewna dewam keno de bi helîkopteranê xo belavokê eyştê miyanê dewan ke pê şarî bixapênê û şerkeranê şarê kurdî terorîst nîşan bidê.



Bi raverşiyayînê şerê şarê kurdî ra ca bi ca rojnamey û televîzyonî bi destê însanêkey cehşê, vetî werte. Zey nimûne ma eşkenê vajê di Amed de televîzyonê Söz–TV, û Rojnameyê rocîn ê Söz. Reyna Radûnê Vengê Dîcle her kes pê zano û nimûneyê verçiman o. Enî heme zî di demê raverşiyayînê şarê kurdî de veciyay werte. Gama radûnê Vengê Dîjle vet a çaxî radûnê "Vengê Kurdistanî o serbixwe" weşanê xo dewam kerdêne, li hemverî êy vet. Reyna demê Söz–TV'î di Amed de vet werte, a çaxi zî kurdî di demê serhewadayin de bî.

Ewro jî kurdî rayna û awaykew xurt di her warê xo de ravêr şênê û dewlete di her warî de wazena vernî bigîro. Hemverî partî kurdan partî vetî feyde nêkerd û nika zî hemverî televîzyonê kurdan televîzyonê ke alternatîf awan kena. Hem jî bi destê Mesûd Barzanî.


Ze ke yeno zanayîn semedo merdim televîzyonê ke rono, viraştinê êrê bi milyonan dolar perey lazim ê. Semedo ke yew televîzyonê ke virazo gere ya dewletê ke paştey cê de bo, ya zî gere şarê cê heme paştey cê de bo ke beşko televîzyonê ke rono. Nawey zeke yeno zanayîn şarê kurdî heme paştey Barzanî de niyê, ke televîzyonê ke anayîn rono.

Li gorey vatinanê peyînan paştey Barzanî de dewletey tirkî esta û dewlete bi destê İlknur Çevikî televîzyonêke qeybî Barzanî, ke eno televîzyon gorey vatinan go di Kurdistan û henî dewletanê Ewrûpa de weşanê xo bikero. Zeke henî vanê di televîzyon de go ca bidiyo xeberan, muzîk û henî zî vanê go ca bidiyo fîlmanê tirkan zî. Enê televîzyon li gorey Barzanî go aşmey avrêlî de weşan bikero û li gorey derdorên demokratîk eno televîzyon li hemverê televîzyonê MED'î zey alternatîf vecenê werte.

Henî derdorî zî vanê ke çawey pîlanê dewlete ê bînî aw de şî go eno zî ow de şoro. La eno zî yena zanayîn ke çiqas planên dewlete aw de şorî zî go dewlete pîlananê bînana veco hemverî şar û şerê kurdî.

Çike (hendî) şarê kurd, şaro verîn niyo. Kam qandê kurd û Kurdistanî kar keno û nêkeno înan şinasneno û gorey înan biryarê xo dano. Çiqa eşkenê wa radyo û televîzyonan rono.

CEMİL ANDOK



MEHMET YILDIZ

*Dûr neçe heval... na na tu dûr neçe!*
*Zemherî ye, sar e, tofan e neçe*
*Veke çavan looo...!*
*Zanim xew şêrîn e lê rabe*
*Nobedariya man u nemanê ye, rabe*
*Va ye binêr! Berbangê avêt dîsa*
*Roj derdikeve agir bi çiyan dikeve*
*Va ye binêr bihar e dîsa bibihîze*
*Dengê berfa ku diherike*
*Dengê dilê ku dihele*
*...*
*Niha serî rake, çavan veke û biqîre*
*Wek straneke azadiyê doçika xwe lê ke*
*Tola mezin li bîskiyê ke*
*Destek li ser nîg*
*Bi destê din tilîlî ke*

Roja 18.11.1998 li Çiyayê Nûrhaqê tevî sê hevalên xwe kete nav karwana pakrewanan.

**Şehadeta we riya me ronî dike!**

**LI SER NAVÊ WELATPARÊZÊN ELBÎSTANÊ, EGÎT**

# Ragihandin




Ji ber ku biryara Hilbijartina Giştî bo 18'ê avrêla (nîsan) 1999'an hatiye girtin, lîsteyên qeyda hilbijêran li muxtar û cihên ku wan diyar kiriye hatine daleqandin. Em ji hemû endam û dilxwazên partiya xwe dixwazin ku herin li lîsteyan binêrin û heke navê xwe tê de nebînin, navê xwe bidin nivîsandin. Divê reyeke HADEP'ê jî ji ber ketimbûnê bi avê de neçe. Bi bîr û baweriya ku dê gelê me berpirsiya xwe bîne cih em rêz û silavên xwe pêşkêş dikin û sersala gelê xwe pîroz dikin.

**Navenda Giştî ya HADEP'ê**

Azadiya WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ (Haftalık Gazete)
■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi) M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri: İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308 Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212) 245 16 50 – 251 79 37 – 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerînendeyê Giştî yê Weşanê (Genel Yayın Yönetmeni) SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon: Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN BİRYAY Dağıtım
■ NIVÎSGEHÊN TÊKILIYÊ (İrtibat büroları)
■ Amed: Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mêrsîn Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmîr Tel-fax: 0 (232) 425 37 02
■ Edene Tel: 0 (322) 351 42 78
■ Munchen: (Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê) Mahmut Gergerli Tel: 49 871 672 29 Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre: İhsan Kurt Tel–fax 41 21 652 76 07
■ Hollanda: S. A. Fewzi Tel–Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye: Jana Seyda Helim Yûsiv

# Hesabê wan dê di gewriya wan de bimîne

Hemû partî hesabên xwe li ser neketina hilbijartinan a HADEP'ê dikin. Ev, polîtîkayeke erzan e û bêexlaqî ye. Li gelek bajaran ev yek wisa ye. Misoger wê HADEP têkeve hilbijartinan û wê hesabê wan jî di gewriya wan de bimîne.

*Em li ser rewşa HADEP'ê ya Kurdistanê, amadehiyên ji bo hilbijartinê û li ser pêvajoya siyasî ya dawî ya herêmê bi Serokê HADEP'a Amedê Av. Feridun Çelik re axivîn.*

***Ji pêvajoya HEP'ê hetanî HADEP'ê, ev dike heşt sal, tevgera siyasî ya legal a kurdan di vê heyamê de çendî bi pêş ve çû. Ango mirov dikare bibêje ku êdî kurd di warê polîtîkayê de pijyane û perisîne?***

● Niha, ji HEP'ê hetanî HADEP'ê em di pêvajoyeke gelekî dijwar re derbas bûn. Di vê heyamê de û her wiha niha jî dewlet bi her cure metodên çewisandinê bi ser me de hat. Xwest ku me bifetisîne. Sê partiyên me hatin qufilandin. Lê belê gelê kurd dev ji vî warî berneda û her ku diçe di vî warî de bi şarezayî dimeşe. Niha gelê kurd di HADEP'ê de teşeya siyasetae xwe ya legal saz kiriye. HADEP'ê di warê siyaseta legal de ne tenê saziya kurdan e, her wiha ya hemû bindest, kedkar û derdorên demokrasîxwaz e jî. Piraniya kadroyên me ji HEP'ê vir de ye ku di vî warî de dixebitin. Di vê heyama heşt salî de me gelek tecrûbe bi dest xistine û em ji her demê bêtir ji xwe bawer in.

***Gelê kurd di dîroka xwe de belkî jî ev cara yekem e ku ev qasî bi zanistî û dorfirehî ber bi desthilatdariya xwe ve diçe. Di vê hilbijartina pêşiya me de qet nebe di warê herêmî de wê derfeta birêvebirinê bi dest bixe. Ev yek ji bo gelê kurd pêngaveke gelekî girîng e. Ger di vê ceribandinê de kurd bi ser bikevin wê hem kadro bi xwe ewle bin û hem jî baweriya gel dê xurtir bibe. Bi vê nêrînê niha, HADEP di bin berpirsiyariyeke girîng a dîrokî de ye. HADEP çendî hay ji vê heye? Amadehiyên hilgirtina vî barî di çi astê de ne?***


● Serokê giştî yê partiya me jî dibêje: "HADEP tevgera gel e." Di rastiya xwe de jî, ev tevgera gel dixwaze di warê herêmî de bibe îqtîdar û bi awayekî giştî bibe hêzeke xurt ji bo çareseriya kêşeyê. HADEP ji bo van her du hedefan jî di nava liv û lebatê de ye.

Di warê belediyeyan de jî li bajar û navçeyên herêmê emê ji sedê heftiyê desthilatdariyê bi dest bixin. Li gorî vê rasteqîniyê em amadekariyên xwe dimeşînin. Nemaze, Amed di her warî de ji navçe û bajarên me re dibe mînak. Jixwe em di warê stratejiya hilbijartinên herêmî de bi rêxistinên xwe yên din re di nav xebatên hevbeş de ne. Kadroyên me jî, ji bo hilgirtin û jiheqderketina vî karî xwe amade dikin.

> Di warê belediyeyan de jî li bajar û navçeyên herêmê emê ji sedî heftiyê desthilatdariyê bi dest bixin. Li gorî vê rasteqîniyê em amadekariyên xwe dimeşînin. Nemaze, Amed di her warî de ji navçe û bajarên me re dibe mînak.

***Li navçeyên Amedê rewş çawa ye. Li kîjan navçeyê, HADEP çendî birêxistî ye. Piştgiriya gelê navçeyan a ji bo we di çi astê de ye?***

● Niha, em li navenda Amedê, li sê navçeyan û du beldeyan ji sedî sed xwe li îqtîdarê dibînin. Ev misoger e. Li navçeyên Farqîn, Bismil, Çınar û Erxeniyê jî teşkîlatên me hene û em bawer in li van navçeyan jî belediyeyan bi dest bixin. Li hin navçeyan ji ber mercên neyinî birêxistinbûna me pirsgirêk e. Digel vê yekê jî, em li hemû navçeyan partiya yekemîn in. Nemaze li navçeyan, çewsandinên tund yên dewletê hene. Ev, li ber xebatên me dibe asteng û nahêle ku tercîha rastîn a gel di sandoqan de xwe bide der.



***Wê heman rewş di vê hilbijartinê de jî hebe, gelo?***

● Nîşaneyên ku wê dewlet ji niha ve mudaxeleyî hilbijartinan bike, ji niha dixuyin. Çendekî berê Serokomarê dewleta tirk Süleyman Demirel xwestiye ku hilbijartinên herêmî bi du tûran pêk bên. Serokê Partiya Fazîletê ji ber vê yekê dixeyide. Demirel jê re dibêje: "Ev ne ji bo we ye, tirsa me ji HADEP'ê ye. Hevalên me yên navendê ji bo zelalkirina vê yekê nameyek ji Demirel re şand. Lê wî qet hewce nedîtiye ku bersiva nameyê bide. Lewre jî wisa dixuye ku dewlet dê di heyama hilbijartinê de jî bi rengekî tund çewisandinên xwe bidomîne.

HADEP gel bi xwe ye. Ji bo çareserkirina kêşeyên civakî hêza herî çalak û mezin a Tirkiyeyê ye. Xuya ye hin hêzên dewletê ji vê hêza me ditirsin û gelekî aciz dibin. Jixwe van çavtirsandin û gefan, çawa ku duh em netirsandibin, îro jî em qet pax pê nakin. Berevajî vê, li têkoşîn û xebatên xwe zêdetir sor dibin.

***Li herêmê hêzên ku HADEP'ê pê re îtifaqê bikin hene, gelo?***

● HADEP li herêmê tekane partî ye, di xêza xwe de hêzeke bi serê xwe ye. Digel ewqas êrîşên hov û bêperwa jî partiya herî mezin a herêmê ye. Nûnertiya vîna siyasî ya gelê kurd HADEP dike. Belkî hin partiyên din hebin, lê bes ew, tabela bi tenê ne, bêbingeh in û cemawer bi wan re tune ye. Digel her tiştî derê me ji her kesî re vekirî ye. Ne ku xwe bi zorê araste bikin, di çarçoveya hevkarî û piştgiriyê de em vekirî ne. Hemû partî hesabên xwe li ser neketina hilbijartinan a HADEP'ê dikin. Ev, polîtîkayeke erzan e û bêexlaqî ye. Li gelek bajaran ev yek wisa ye. Misoger wê HADEP bikeve hilbijartinan û wê hesabê wan jî di gewriya wan de bimîne.

***Rêveberiya belediyeyan hinekî ji karê mirovên şareza û têgihiştî ye. HADEP'ê kadroyên xwe yên ji bo belediyeyan li gorî kîjan pîvanan û bi çi metodê bineqîne?***

● Ji bo me pîvan girêdayîbûna bi gel re ye. Li aliyê din divê bikaribe ji gel re xizmet bike; kesayetiya xwe ji gumanan paqij kiribe. Ev kadro jî hene. Li Amedê tu pirsgirêka me ji aliyê kadroyan ve tune ye. Gel wê bi awayekî demokratîk nûnerên xwe hilbijêre. Li Amedê gelek hevalên me yên akademîsyen hene û ji bo projeyan bi me re kar û bar dikin. Em bi xizmeta xwe, bi projeyên xwe û bi gelê xwe ji bo hilbijartinê amade ne. Emê her tim bi gel re tevbigerin û bi gel re pirsgirêkan çareser bikin.

HEVPEYVÎN: ROŞAN LEZGÎN

www.arsivakurd.org